


ROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



37
1993

NAVEROK

Gengeşiya lî ser Alfabeya Kurdi	3
Ditinê Redaksiyona Roja Nû	
lî ser Alfabeya Kurdi	10
Helbest: Ezmanê Kari	14
Helbest: Enwer Omer	15
Pêşniyazek jî nîvîskarê Kurd	
Mehmed Emin Bozarslan:	
Bîla sala 1995'an bîbe "Sala Ehmedê Xani	
û Mem û Zin"ê	16
Nameya M. Emin Bozarslan ji Unesco ra	18
Dramat: Mem û Zin - R. Alfton, Werger: X. Lezgin	21
Strana folklori, Em lî ser sistemê çi dizanın	25
Bawerya kevn a Persan / 2	
Jiyana Exlaqi, werger: Y. Çakmak, A. Gernas	27

Bergê pêşin : Xelatên Leca Ahmedê Xani

Foto: AZADÎ

Bergê Paşin : Pîra Ebasi lî ser çemê Xabûrê

Foto: Lars Hesselmark

Sal: 14

Hejmar: 80, Çiriya Paşin

ISSN 0283-5355

KWEDİ: KOMKAR-Swêd

BERPIRSIYAR: Şêroyê BOTAN

NAVNIŞAN: Gustavslundsv.168,1 tr
161 36 STOCKHOLM

TELEFON : 08/26 23 75

HESAP NO: PG. 458980 - 0

UTGIVARE: Svensk Kurdiska

Arbetarföreningen

ANSVARIG UTGIVARE: Ş. BOTAN

ADRESS: Gustavslundv. 168, 1 tr.
161 36 STOCKHOLM

FAX: 08/25 38 57

Gengeşıya lı ser Alfebeya Kurdi

Dı mehêن çûyi da, Enstituya Kurdi a Stenbolê jı bo nıqaşkirına alfebeya kurdi du civin çêkîrin. Lı ser banga Enstituyê, berpîrsiyarên rojname û kovaran û hîn kesêن niviskar besdari civinan bûn. Wan, jı bo standartkirina Alfabeya kurdi, ditin û pêşniyazên xwe anin ziman. Pişti van civinan Enstituyê raporek weşand. Wek kovara Roja Nû em vê pîrsê geleki gîring dibinin. Jı ber vê yekê em rapora Enstituyê û dîgel wê ji ditinê redaksiyona Roja Nû ên derheqa alfebeyê da carekê disan lı vir pêşkêsi raya xwendevanê xwe dîkin.

RAPORA ENSTITUYA KURDİ A STENBOLÊ

Di bin pêşengiya Komita Karger a Enstituya Kurdi de, di roja 31.07.1993'an de, li Navenda çanda Mezopotamya civinek li ser alfebeya Kurdi hat çêkîrin. Beriya ku civin bê organizekirin, berpîrsiyarên Enstituya Kurdi bî berpîrsiyarên kovar, rojname, weşanxaneyan û bî niviskarên Kurd re ketin têkiliyê û jı bo ku ew ji besdari civinê bibin, bang lı wan kîrin. Lı ser vê banga Enstituya Kurdi, jı rojnameya Azadi Latif Epozdemir, jı Kovara Nûbaharê Sabah Kara û Suleyman Çevik, jı Rojnameya Medya Gunesi Osman Aytar, jı Rojnameya Welat Zana Farqini û Mazhar Gunbat; jı niviskarên Kurd Feqi Huseyn Sagnic û mameste Tori besdar bûn. Serokê Enstituya Kurdi Şefik Beyaz û endamê Komita Karger a Enstituya Kurdi Felat Dilgeş lı ser navê Enstituyê besdari civinê bûn.

Serokê Enstituya Kurdi Şefik Beyaz bî axaftineke kurt besdarên civinê dî derbareyê pêvajoyê de agahdar kîr. Şefik Beyaz dî axaftina xwe de beyan kîr ku ew bî kesêن ku xebatêن wan lı ser rêziman û alfabeaya Kurdi hene re ketine têkiliyê û ewê jı niha bî şûn de ji van têkiliyê xwe bidominin.

Pişti Şefik Beyaz, Endamê Komita Karger

a Enstituya Kurdi Felat Dilgeş mafê axaftinê stand. Felat Dilgeş dî axaftina xwe de lı ser diroka amadekirina alfabeaya Kurdi ya Latini rawesta; vê alfabeyle, bî hîn nimûneyên balkêş bî alfabeaya Erebi re rûbirû kîr û lı ser pîrsê alfabeaya Kurdi ya Latini ya ku himêñ wê ji ali Celadet Bedirxan ve hatiye danin, sekini.

Felat Dilgeş dî axaftina xwe de weha got:

"Gelo Celadet Bedirxan bî ci awayi alfabeyleke Kurdi ya Latini ya jı 31 tipan pêk ani? Beri her tiştî dîvê em vê yekê baş bizanibin ku Celadet Bedirxan zîmanzan bû. Wi, jı bili zîmanê Kurdi, bî zîmanê Fransizi, İngilizi, Almani, Farisi, Erebi, Yunani û Tîrki dizanibû.

Heke em zîmanê Osmani ji zîmaneki serbixwe bîhesibinin, Celadet Bedirxan bî Osmani ji dizanibû. Xebatên Celadet Bedirxan lı ser zaravayên Kurdi ji hebûn û wi dî amadekirina alfabeaya xwe de rastiya hemû zaravayên Kurdi ji girtibû ber çavê xwe; lı gor dengen van zaravayan ji alfabeaya xwe saz kîribû. Celadet Bedirxan dî pîrsa felsefeya zîman de ji xwedi agahdarî bû.

Em dikarin bîbêjin ku alfabeaya Kurdi ya

Latini ya ku ji 31 dengan pêk hat, dî navbera salên 1919-1932'an de çêbû. Celadet Bedirxan dî vê demê de xebatê zimanzanê Kurd ên weki Xelil Xeyali nirxand û ji wan istifade kîr. Dî gel ku Celadet Bedirxan di pirsên ziman de pispor bû ji, beriya ku ew dî alfabe û gramera xwe de guhertinekê çêbîke, bî kesen der û dora xwe re, lî ser pirsên heyi munaqeşe dikir û bi wan dişêwiri. Bî vi awayi dî bin pêşengîya Celadet Bedirxan de, lî der û dora Kovara Hawarê ekolek çêbûbû. Qet şık tuneye ku Celadet Bedirxan dî vê ekolê de mamoste, rîber û pêşkiş bû.

Celadet Bedirxan di pêvajoya bikaranin û lî ser bîngeheke zanisti runıştanâna alfabe Kurdi de, tu car ji guhartinan nereviya û dî xebatê xwe yên lî ser ziman de ji tabû û dogmayan dûr ma. Jî bo wi, heke guhertin pêwist bîwa, ew tu cari ji guhertinan nedireviya. Dî vi wari de nimûneya heri balkêş ev e: Celadet Bedirxan di seri de alfabe xwe ji 26 tipan (dengan) pêk ani, dî pey de ji 26'an derket 36'an û bî vi awayi 10 tip lê zêde kîr; dî vê pêvajoyê de ji alfabe Yunani û Rusi istifade kîr. Dî pey de dev ji bikaranina tipen Yunani û Rusi berda û hejmara dengen alfabe xwe daxist ser 31'an. Em ji xebatê wi yên lî ser alfabe fêr dibin ku Celadet Bedirxan, heta ku ji destê wi tê ji bikaranina dîftongan (pevdeng) xwe dûr dixe û dixwaze ku alfabe xwe hêsanter bike. Disa em ji xebatê wi yên lî ser alfabe hin dibin ku heta ku ji destê Celadet Bedirxan tê, alfabe xwe nêziki alfabe Türkî dîke û ji hin tipen ku di alfabe Türkî de hene istifade dîke. Dî gel ku Celadet Bedirxan heta hejmara 23'an a Hawarê, tipa "k"yê dî ciyê "q"yê ya ku em iro dî alfabe Kurdi de bikartinin dixebeitine ji, ew ji hejmara 24'an wê de ciyê van dengan diuguherine. Yani heta hejmara 24'an a Hawarê peyvîn weki "qelem", "qazi", "qeşmer", "qewraş", bî awaye "kelem", "kazi", "kewraş" têri nîvisandin.

Bî qasi ku em dizanîn, diroka munaqeşeyen lî ser alfabe Kurdi ya Latini kevn e. Hê dî dema amadekirina vê alfabe de Celadet Bedirxan bî gelek kesan re ketibû têkiliyê û lî ser vê pirsê bî wan re munaqeşe kiribû. Herweki ku em ji pêşgotina Dr. Nuredin Zaza ya ji çapa

dîwemin a hejmarê 24 û 57 ên Hawarê ji hin dibin, kesen weki Hemzeyê Mîksi û Ekrem Cemil Paşa, pîr kîmasiyân di alfabe Celadet Bedirxan de dibinîn.

Gelo iro munaqeşeyen ku lî ser alfabe Kurdi ya Latini çedîbin, di kijan çarçowê de ne? An bî awayekî dîn pirsên alfabe Kurdi çî ne? Lî gor ditina min, munaqeşeyen heri mezin bî vi awayi dikarin bîn parvekirin:

- 1 - Zêdekîrina dengen alfabe
- 2 - Kêmkîrina dengen alfabe
- 3 - Jî alfabe avêtina tipen bî kumik û bî niçik
- 4 - Dî alfabe Kurdi de bikaranina tipen Türkî
- 5 - Jî bo dengen "p, ç, t, k, r" bikaranina tipen cihê

6 - Dî ziman de bikaranina dîftongen zêde
7 - "î" û "ı" ya Kurdi wek "î" û "ç" Türkî nîvisin

1 - Zêdekîrina dengen alfabe: Celadet Bedirxan bî hesteke zimanzani lî alfabe Kurdi dîmîhert. Bî qasi ku ew dî pirsên ziman de pispor bû, ewqas ji ew dî derheqê rastiya cîvata Kurdi de xwedi agahdar bû. Celadet Bedirxan baş dizanibû ku zêdekîrina dengen alfabeylekê ne merifet e. Herweha ev pîrs bî dewlemendîya ziman ve ji nikare bê girêdan.

Zimanzan Saussuare di xebatê xwe yên lî ser ziman de weha dibêje: "Tu alfabeylek nikare hemû dengen zimaneki bide." Dema ku em hisê xwe lî ser zimaneki bêşinîn û bî awayekî zanisti lî serê rawestin, emê bî çavê xwe bibinîn ku bî rasti ji tu alfabeylek nikare hemû dengê zimaneki bide. Celadet Bedirxan ji vê rastiyê agahdar bû. Lewra wi baş dizanibû ku zêdekîrina tipen dê alfabe dîjwar bike û tê de tevliheviyan peyda bike. Dî gel ku wi dî çend hejmarê pêşin ên Hawarê de lî ba "H" û "X"yê, "X" û "H" yên bî niqût (X-H) bikarani ji, dî pey de wi dev ji vê yekê berda.

Dî van demen dawi de hin kes alfabe Kurdi ya Latini ya ku himen wi ji ali Celadet Bedirxan ve hatin danin, ji bo zaravayen Kurdi yên weki Dîmîkî (Zazaki) kêm dibinîn. Lê dîvê bîn zanîn ku Celadet Bedirxan dî dema amadekirina alfabe xwe de lî ser zaravayen Kurdi yên dîn ji xebiti û rastiya wan stand ber

çav.

Lı ser zêdekîrîna dengen ez dîkarim vê bibêjîm: Heke em dî bikaranina alfabebla Kurdi de jî bo her dengeki lî işareteki bîgerin, emê tu wexteki nîkarîbin alfabeleye tekûz pêk binin û belki em alfabeleyekê jî 50 tipan zêdetir çêbikin.

2 - Kêmkîrîna dengen alfabeleyê: çawa ku hîn kes zêdekîrîna tipen alfabê rast dîbinin, wîsa ji hîn kes kêmkîrîna tipen alfabeleyê diparêzin. Yênu ku kêmkîrîna dengen alfabeleyê diparêzin, bî pirani vê ditîna xwe bî pîrsa bikaranina kompiturê ve girêdîdin. Dema ku em dengen alfabeleyê kêm bikin, wê gavê dîvê em jî diftongan istifade bikin; ku lî gor ditîna min ev ne durust e û dê xesarê bigihine zîman. Jî xwe hîn dengen bîngehin ên zîmanê me he-ne ku em nîkarîn wan bî diftong û cot-tipan bidin. Rastiyek ji heye dîvê ku em bizanibin: Lî dînê kompitureke standart tune. Hemû dew-lelên dînê lî gor rastiya zîmanê xwe dî kom-piturê de guhertinan çêkîrîne. Bîsazkîrîna klaviyeyeke Kurdi pîrseke tekniki ye û bî hê-sani dîkare bê çareserkîrîn.

3 - Jî alfabê avêtîna tipen bî kûmîk û bî niçik: Hîn kes ji, ji alfabeyâ Kurdi avêtîna tipen bî kumîk (i, û, ê) û bî niçik (ş, ç) diparêzin. Dî bîngeha vê ditînê de ji, daxwaza bî hêsanî ji kompiturê istifadekirînê heye. Bê-guman bî vi awayi ji hîn dengen bîngehin ên alfabebla Kurdi têni avêtîn. Lî gor vê ditînê, di ciyê "ş" yê de "sh", di ciyê "ç" yê de "ch", di ciyê "i" yê de cot "î" (ii), di ciyê "û" yê de cot "u" (uu), di ciyê "ê" yê de cot "u" (uu) yêngîlîzi dîkarîn bêni bikaranin. Bî ya min ev ditîneke çewt e. Lewra alfabebla Kurdi fonetik e. Tip (herf) çewa lî ser kaxîz tê nîvisin, wîsa ji tê xwendin. Yani dî Kurdi de deng = tip e.

4 - Dî alfabebla Kurdi de bikaranina tipen Tîrki: Hîn kesen ku ji alfabebla Kurdi û xebatê Celadet Bedîrxan bêhay in, yan niyeta wan ne baş e, dî nîvisina Kurdi de alfabebla Tîrki bikartîn. Bêguman ev ji bo nîvisina zîmanê Kurdi xetereke mezîn e. Tu bîngeheke zanîsti ya vi kari tune. Dî vi wari de berpirsiyariya heri gring dîkeve ser milê kovar, rojname û weşanxaneyêndi Kurdan.

5 - Jî bo dengen "p, ç, t, k, r" bikaranina

tipen cihê: Dengen (p, ç, t, k, r) bêdengen pîdiyan in. Ev deng di zîmanê Kurdi de weki cotdeng (tipen cêwi) ji têni bînavkîrin. Ev deng, ji ber ku bî du awayan têni bilêvkîrin, ji wan re dengen bêaqsan û biaqsan ji tê gotin. Dî bilêvkîrina dengê bêaqsan de bihn tê dayin, dî bilêvkîrina dengê biaqsan de bihn tê girtin. Dî alfabebla Kurdi de, nemaze di vê mijarê de munaqeşeyen mezîn hene. Lî gor hîn ditînan, tipen cêwi yêngîlîzi bêaqsan û biaqsan ji hevdû cuda ne û dîvê bî işareten cihê bêni nişandan. Lî belê Celadet Bedîrxan ji tê de, hîn filologen zîmanê Kurdi, lî dîji cihê nişandana tipen bêaqsan û biaqsan in. Celadet Bedîrxan dî xebatê xwe yêngîlîzi lî ser alfabebla Kurdi de beyan dîke ku cihderka bêdengen pîdiyan ên bêaqsan û biaqsan yek in. Lî gor ditîna wi, weki tipen serbixwe nişandayîna dengen biaqsan û bêaqsan çewt e; lewra cihderka wan yek e.

Osman Sebri, ku yek ji endamên ekola Hawarê ye, ji seri de li dîji vê ditîna Celadet Bedîrxan derdikeve. Dengê bêaqsan û biaqsan weki dengen serbixwe yêngîlîzi alfabebla Kurdi dîbine. Herweki tê zanîn, Kurdêng Sovyetê ji dengê bêaqsan bî apstrofekê ji dengen biaqsan diqetinin û wan weki dengen serbixwe nişan didin. Nîviskarê Kurd Baran Rîzgar ji dî fer-henga xwe ya Kurdi-İngiliz, İngiliz-Kurdi de dengê biaqsan bî bînxetekê ji dengê bêaqsan cuda kiriye. Baran Rîzgar bî armanca ji hevdû cudakîrina dengê bêaqsan û biaqsan metodê bînxetkîrinê hilbijartîye.

Herweki tê zanîn, Celadet Bedîrxan dî alfabebla xwe de heta ku ji destê wi hatîye, ji bikaranina işareten weki nuqte, nişan, kumîk û niçikên zêde xwe dûr xistiye. Heta ku ji destê wi hatîye, alfabebla xwe hêsan kiriye. Disa weki ku min li jorê ji beyan kîr Celadet Bedîrxan cihderka dengê bêaqsan û biaqsan eyîn dîbine. Dî vê rewşê de, bî van dengan bikaranina tipen cihê, dê dî alfabebla Kurdi de dijwariyêngîlîzi mezîn çêbîke. Jî ber ku dî alfabebla Latini de ji bo yek dengeki işareten cihê nîkarîn bêni bikaranin. Jî bo dengê biaqsan danna işaretekê, wê pê re hejmara dengen alfabeleyê ji 31'an derxe 36'an. Bêguman mesele bî tenê bî vê ji naqede, hîn dengen dîn ên ku mu-naqeşê li ser çêdîbin ji hene.

Lı gor ditina min tiştê heri baş di mijara bêdengên pidiyan de parastina alfabebla Celadet Bedirxan e.

6 - Dı ziman de bikaranina diftongen zêde: Dı van demen dawi de hin kes, dı alfabebla Kurdi de bikaranina çend diftongan pêşniyar dikin û di nivisê xwe de dixwazin ku vê yekê bikarbinin. Herweki tê zanin Celadet Bedirxan bı xwe ji dı seri de ji çend diftongan istifade kiriye; lê dawiyê hejmara diftongan anye ser yeki. Dı hin hejmarê Hawarê de mirov rasti diftongen weki "kw" û "kh" yê tê, lê belê em dibinin ku ji demekê bı şûn de ev diftong nayê bikaranin. Celadet Bedirxan bı xwe ji li diji zêde bikaranina diftongan e. Ez ji di vê baweriyê de me ku dı alfabebla Kurd de bikaranina çend diftongen din ne pêwist in û ev yek dê dijwariyê alfabebla zêdetur bike.

7 - "î" û "i" ya Kurdi wek "î" û "i" Tırki nivisin: Dı alfabebla Kurdi de, dı ciyê "î" û "i" ya Kurdi de, bikaranina "î" û "i" ya Tırki tu demekê ji rojevê derneketiye. Her tişt li aliyeki, iro di weşanê Kurdistan de bikaranina "i" û "i" ya Tırki rastiyek cıvata me ye. Em dikarin bibejin ku ji bili problema "i" û "i" ya Kurdi, piraniya Kurdistan parastina alfabebla Celadet Bedirxan dixwazin.

Hin kes di alfabebla Kurdi de bikaranina "i" û "i" ya Tırki, bı xwe nêzikkirina gıyana Tırkbûnê ve girê didin. Lê belê ev ditineke çewt e. Ew kesen ku li ser xebatê Celadet Bedirxan ên dı pirsa alfabe de sekînine, dîvê bı çavê xwe ditibin ku Celadet Bedirxan tu car ji bikaranina dengen alfabebla Tırki nereviyaye. Lê belê, Celadet Bedirxan xwestiye ku alfabebla xwe nêziki alfabebla Tırki bike. Ma gelo tipen weki "ç" û "ş" yê ji bili alfabebla Tırki, dı kijan alfabebla de hene? Celadet Bedirxan dı pêkanina tipen alfabebla xwe de rastiya gelê Kurd digire ber çavê xwe ku pirê wan li bakûrê Kurdistanê, dı bin hegemonya siyasi ya Tırkan de dijin. Celadet Bedirxan ne bi tenê carekê, gelek caran dibeje ku me xwe nêziki alfabebla Tırki kir û xwe jê dûr nexist.

Celadet Bedirxan ne ji ber kurt an dirêjbûna "i" û "î" ya Kurdi bı kumik û bı nuqtê bikarani. Pirşûrek bı tevayı tekniki bû. Klaviya ku Celadet Bedirxan bikartani ya

Firansızan bû û tê de "i" ya Tırki tune bû.

Dı seri de ez bı xwe ji, aligirê parastina "î" û "i" ya Kurdi bûm; lê iro dema ku ez rastiya cıvata Kurdi tinim ber çavê xwe, ez vê yekê dibinim: Avêtina kumik û bikaranina "i" û "i" ya Tırki dê alfabebla Kurdi hêşantır bike û di xwendin û nivisinê de ji astengekê rizgar bike. Jı ber ku alfabebla Kurdi fonetik e, tu têkiliyek vê guhertinê bı dengan re tune."

Berpîrsiyarê gîsti yê Rojnama Medya Guneşi Osman Aytar, ditinê xwe bı vi awayi ani ziman : "Guhartina hin tipen alfabebla, ji hemû tiştî zêdetir tiştî tercihê ye. Heke em terciha xwe li ser kijan işaretê bidin, emê bikaribin wê hilbijêrin. Xuya ye ku iro bı du awayan nivisina tipen "i" û "i" yê tevliheviyekê bı xwe re tine. Dîvê ku ev tevlihevi ji holê rabibe. Lê dîvê neyê ji bir kîrin ku aliyen siyasi yên pîrsê ji hene. Heke lihevhatineke gîsti çêbibe, dı şûna "i" û "î" yê de "i" û "i" ya ku di zimanê Tırki de tê bikaranin, dikare bê tercihkirin.

Zana Farqini di ahaftina xwe de li ser pêleyistina alfabebla Kurdi ya Latini rawest û weha got: "Dı hin nivisan de "i" bı "i" yê, "î" bı "î" yê, "x" bı "g" yê, "ê" bı "e" yê û "w" bı "v" yê tên guhertin. Bı vi awayi di ciyê alfabebla Kurdi de alfabebla Tırki tê bikaranin. Ez bı xwe ne li diji guhertinê pêwist im. Lê dîvê ku guhertin xesarê nede alfabebla Kurdi. Celadet Bedirxan, bı pêşniyara Eli Seyda Gewrani tipa "k" bı "q" yê guhart û ji hejmara 24'an a Hewarê wê de "q" di ciyê "k" yê de hat bikaranin.

Lı gor ditina min di alfabebla Kurdi de bikaranina tipen "i" û "i" ya Tırki dê baş bibe. Dema ku em vê guhertinê çêbikin, dê alfabebla Kurdi bêtir hêşan bibe, ji xwe Celadet Bedirxan bı xwe ji dibêje ku 'me alfabebla xwe nêziki ya Tırki kiriye'. Hewce ye ku di vê pîrsê de em danûstandına xwe û Tırkan ji bigirin ber çavan. Bi rasti ji, yên ku bi Tırki dixwinin û dinivisin, di xwendin û nivisina "i" û "î" ya Kurdi de zehmet dikişinin. Dı alfabebla Kurdi de bikaranina "i" û "i" ya Tırki, dê karê xwendin û nivisinê hêşantır bike."

Berpîrsiyarê gîsti yê Kovara Nûbiharê Sabah Kara di ahaftina xwe de weha got: "Herweki tê zanin, di alfabebla Erebi de tipa "i" yê tu-

ne ye. Dı nivisina bı alfabeyle Erebi de dengê "ı" nayê nivisin. Problema me ji "ı" ye. Dema ku em tipa "ı"yê ji alfabe bavêjin, dê meseleya me nemine. Wê gavê emê "ı" dı ciyê "ı"yê de bikarbinin. Dı rewşek weha de, dê "ı"ya me ji bibe weki "ı"ya Ingilizi. Jı demeke dirêj de ye ku ez li ser gramerê dixebitum. Min dı gramera xwe de tipa "ı"yê bikarneaniye: Dema ku em tipa "ı"yê rakin, em dê van peyvên jêrin bı vi awayi bînîvisin:

kîrîn - krn

mîrîn - mrn

bîrîn - brn

gotîn - gotn

pir - pr

Çawa ku dı alfabeyle Erebi de dengê "ı"yê tune û dı vê pirsê de problem dernakevin, bı vi awayi emê ji, ji problema "ı"yê xelas bibin.

Lı gor ditina min, divê ku em kumikê li ser "ê"yê ji rabikin û dı şûna kumikê de apostrofê (') bikarbinin. Jı xwe dı hemû klaviyan de "é"ya bı apostrofê heye. Wê gavê ne hewce ye ku em kumik deynin ser "ê"yê. Herweha em dikarin kumikê ser "û"yê ji rabikin û dı şûna "û"yê de "o" bikarbinin. Dı zimanê Ingilizi de dengê dirêj bı coti têr nivisin.

Ez dixwazim vê ji bêjim: Heke Enstituya Kurdi bîryara bikaranina "ı" û "ç"ya Tîrki bîstine, em dê li gor vê bîryarê bîlivin. Niviskarê Kurd Feqi Huseyn Sagnîc dı axaftina xwe de weha got: "Ez gotinê Felat Dilgesh ên weki "tu alfabeyle nikare hemû dengê zimaneki bide" rast û dı cih de dibinim. Ez bı xwe ji ji bo zimanê Kurdi dikarim vê bîbêjim: "Heke em ji bo her dengeki ku dı zimanê me de heye li işaretekê (tipekê) bîgerin, wê gavê belki em alfabeyle ji 70 tipan amade bikin. Ev yek ji, dê problemen alfabeyle Kurdi zêdetir bike.

Dı dora 20 salan de ye ku ez li ser gramera zimanê Kurdi dixebitum. Beriya ku gramera Celadet Bedirxan bîkeve destê min, min gramera xwe ji bo çapê amade kir. Ev gramera min a ku niha çap bûye, dı 1978'an de amade bû. Dı ser van hemû tiştan de ez dixwazim vê bîbêjim: Heke Enstituya Kurdi gramereki amade bike, ez dikarim dev ji gotin û kîrinê xwe yê 20 salan berdim.

Dı mijara kumik de ji ditina min ev e: Celadet Bedirxan ji ber ku klaviya Frenszik bikartani, kumik pejirand û dı alfabeyle xwe de xebitand."

Niviskarê Kurd Tori dı axaftina xwe de weha got: "Divê em bizanibin ku "ı" û "ı"yê Kurdi ne weki "ı" û "ç"yê Tîrki ne. Ev deng, ji hevdû cihê ne. Ne "ı"ya me weki "ı"ya Tîrki tê xwendin ne ji "ı"ya me weki "ç"ya Tîrki tê xwendin. Dema ku em "ı" û "ı"ya Kurdi biguherinin, emê zimanê xwe têk bibin. Jı ber ku "ı" û "ı"yê me ji yê Tîrkan cihêtir in, Celadet Bedirxan blindek bikarani.

Heval Felat Dilgesh ji hêsankırınê qal dike! Ka bila bîbêje, hêsankırın çi ye? An ku hêsankırın têkbirina zimanê Kurdi ye! Dema ku em "ı" û "ı" ya xwe biguherinin û bı qaydê ku Tîrki dînîvisin, bînîvisin, dê ew gavê xwendevanê Kurd ji "ı" û "ı"ya Kurdi weki "ı" û "ı"ya Tîrki" bixwinin. Ez bı xwe li hember guhertuna "ı" û "ı"ya Kurdi me û ez tiştiki weha durust nabinim."

Niviskarê Rojnameya Azadi Latif Epozdemir, dı axafîtna xwe de weha got: "Dı alfabeyle Kurdi ya Latini de bı du awayan nivisina "ı" û "ı"yê problemek e û divê ku dı dema heri nêzik de ev problem ji holê bê rakîn. Bêguman, ancax bı saya sazgehêw weki enstituyê, emê bikaribin pirsên xwe yê weha çareser bikin. Ez dı wê baweriyê de me ku bikaranina "ı" û "ı"ya Tîrki dê tu xesarekê nede zimanê Kurdi û nade ji. Hemin ku tu xesarê nade ziman, çima em alfabeyle xwe ji astengekê xelas nekin! Ez ji dı wê baweriyê de me ku pîrsa bikaranina "ı" û "ı"ya Tîrki pîrseke tercihi ye. Yani em kijan tipan tercih bikin, emê dı alfabeyle xwe de wan bikarbinin."

Civina diwemin a li ser alfabeyle Kurdi dı roja 21.08.1993'an de, disa li Navenda çanda Mezopotamiya çêbû. Jı rojnameya Welat Nijad Yaruk û Zana Farqini, jı rojnama Azadi Latif Epozdemir, jı kovara Nûbiharê Sabah Kara, jı Enstituya Kurdi Felat Dilgesh, Huseyn Kaytan û Şefik Beyaz; niviskarên Kurd Feqi Huseyn Sagnîc û Tori besdar bûn.

Pîsti ku civin ji ali serokê Enstituya Kurdi Şefik Beyaz de hat vekîrin, li ser navê rojnameya Welat Nijad Yaruk dest bı axaftinê kir.

Nijad Yaruk dî axaftuna xwe de weha got:

"EZ dixwazim lî ser navê rojnameya Welat ditinê xwe binim ziman. Ezê çend rexneyê xwe bibêjim, lê dîvê hûn bîborin.

Lî gor ditina me, dîvê destpêka xebatênen enstituyê ne munaqşeyê lî ser alfabetê bûna. Me hin xebatênen dîn jî enstituyê dîpa. Heke guertinek pêwist be ji, iro ne wextê vi kari ye. Dîvê ku ditinê ev kesen ku xebatê wan dî vi wari de hene, bîhata pîrsin. Heke Enstituya Kurdi dî vê mijarê de bî ser nekeve, dê hebûna wê bikeve talûkê. Dî seri de, jî bo kontrol-kirina weşanênen Kurdi komisyonek dikaribû bîhata çêkirin. Em bî xwe xebateke weha diparêzin. Dî bikaranina peyvan de gelek ciheti hene, dîvê ku dî vê pîrsê de xebat bênen kirin.

Bingehek heye û dîvê ev bingeh bê xurt-kirin. Ku ev bingeh neyê xurtkirin, guhertina tipan tişteki çareser nake. Bîla enstitu karê klaviyekê bigire ser xwe."

Niviskarê rojnameya Azadi Latif Epozdemir dî peyivina xwe de weha got:

"Dîvê enstitu di van pîrsan de berpîrsiyar be. Dîvê enstitu lî ser vê meselê xebateke baş bîke û dîvê enstitu nebe şaxek rîxistinêni siyasi. Ne hewce ye ku dî vê pîrsê de komisyonê taybeti bênen avakirin. Dîvê hemû kes bîryarênen enstituyê biparêze.

Diyar e ku hemû kes guhertinê dixwaze. Baş e, guhertin wê kingê çêbibe? Dîvê guhertin jî bo dema pêş neyê taloqkirin û dîvê heqê guhertinê jî bo enstituyê hebe. Ez bî xwe lî ser navê xwe dikarim vê bibêjim: Enstitu çi bîryarê bigre, ezê bîpejirinim û ezê dî nîvisen xwe de bikarbinim.

Iro dî nav weşanênen Kurdi de qetandinek (cihêtîyek - newekheviyek) heye. Çend kes dikare bî zimanê Kurdi meqaleyen binivise? Jî bo ku gel bikaribe bî zimanê Kurdi bixwine û binivise, dîvê em hêsanîyê çêbikin. Em riya ziman xweş bikin, lê em xesarê nedîn gramera Kurdi."

Niviskarê Kurd Tori dî peyivina xwe da weha got:

"EZ bî xwe guhertina tipen "i" û "î" yê rast nabinim; lewra "i" û "î" ya me ne weki ya Tîrkan e. Hêsanîkirin xerakirina ziman e, an ku pêşvebirîna ziman e? Jî ber ku "i" û "î" ya me

jî ya Tîrkan dîrêjtir e, Celadet Bedîrxan bilindek bikarani. Ez lî hember rakırına bilindekê me."

Endamê Komita Karger a Enstituya Kurdi Felat Dîlgeş ditinênen xwe bî vi awayi ani ziman: "Hevalê ku lî ser navê rojnameya Welat ditinênen xwe beyan dîke, dibêje ku 'dîvê destpêka xebatênen enstituyê ne lî ser alfabetê bûna.' Baş e, dê enstituyê jî kuderê de dest bî xebatênen xwe bîkira? Gelo heta ku pîrsa alfabetê neyê çareserkirin, enstitu dikare dest biavêje kijan pîrsen ziman? Dî xebatênen lî ser zimaneki de gava yekemin xebatênen lî ser alfabetê ne. Xebatênen ferhengi û grameri piştî alfabetê têne. Dema ku mîrov bî alfabeza zimaneki nîzanîbe, ne mumkun e ku mîrov lî ser pîrsen rastnîvisinê û ferhengi yêni wi zîmani tiştên zanisti bîbêje."

Em, kesen ku beşdari vê cîvinê bûne û yênu ku dî derheqê alfabetê de ditinênen xwe jî me re şandîne, bî pîrani jî guhertinê qal dikin. Heval Nejat jî dibêje ku 'heke guhertin pêwist be ji, iro ne wextê wi kari ye'. Baş e, emê guhertinê hewaleyi çi wextê bîkin? An ku emê lî benda şoreşa Kurdistanê bisekinin? Niviskarênen Kurden ku lî Awrûpa dîminin, sedemên lî diji guhertinê derketinê xwe bî pîrani weha nişan didin: 'Heta niha dî gelek pîrtûk û weşanênen Kurdi de alfabeza Celadet Bedîrxan ("i" û "î") hat bikaranin. Heke guhertin çêbibe, dê evqas pîrtûk û weşanênen ku berê derketinê çawa bîbin?' Beri her tişti, ev pîrtûk û weşanênen ku lî derva çap bûne, pîrê wan hê lî welat derneketinê û dî nav gel de belav nebûne. Em baş dizanın ku dî çapa nû ya van pîrtûkan de bî yek komuteki kumik dikare bê rakirin. Heke jî iro de em guhertinênen pêwist çênekin, ez bawer im ku dî pêş de dê karê me bêtür dijwar bîbe.

Heke em mil bîdin enstituyê û bixebeitin jî bo ku enstitu bîbe sazgeheke netewi, tu carekê dê hebûna enstituyê nekeve talûkê. Lî ku em dî xebata zanisti de bî qimet û rûmeta sazgehek wek enstituyê nîzanîbin û xwe jî ferdbûnê rîzgar nekin, jî xwe wê gavê dê hebûna enstituyê tu maneyekê ifade neke.

Mamoste Tori dî axaftuna xwe de jî 'bilindekê' qal dîke. Celadet Bedîrxan, jî bo ku "i" û "î" ya Kurdi jî "i" û "î" ya Tîrki bilindir

bûn, kumîk bikarnani. Jî xwe em di xebatê Celadet Bedirxan de rasti peyva `bilindekê` nayê. Jî bo dengên "î", "ê" û "û" kumîk hatiye bikaranin; mesele ne bîlînbûn an nizimbûn e. Dî nav dengên Kurdi de "a" û "o" ji dengdarê dirêj in. Lî belê Celadet Bedirxan jî bo van dengan kumîk bîkarneaniye. Jî ali din de, tip (harf) dengan işaret dike. Dî işaretkirina dengan de hîlbijartına tipan (herfan) di destê me de ye. Tu meseleyeke guhertîna "î" û "î" ya Kurdi bî dengan re tune. Dî alfabê de hêşankîrînê pêkanîn ji, di pirsa perwerdê, xwendin û nivisinê de taybetuyek giring e. Jî xwe Celadet Bedirxan bî xwe ji heta ku jî destê wi tê, ji bîkaranina nuqte û işaretên zêde direve. Jî ber vê yekê ye ku ew jî bo "ê", "i" û "û" yek işaretekê, kumîk bikartine.

Dî seri de jî bo dengê "i" ya Tîrki şika di nav herfîn dîn de hundabûnê hebû; lî iro em di nivisa Tîrki de dîbinin ku problemek weha ji nemaye."

Niviskarê Kurd Feqi Huseyn Sagnîç ditîna xwe bî vi awayi ani ziman: "Bî qasi ku em dizanîn, dîvî ewili esas bê kolan. Wexta mîrov dest bavêje ziman, himê ziman alfabe ye. Dîvî ewili hûn pirsa alfabeyê çareser bikin. Dema ku tu bibêji iro leza vi kari tune, wê gavê tu dê tu wexti nikaribi dest bavêji vê meselê."

Min dev jî iddiayêن xwe berdaye. Heke bibêjin filankeso weha nivisiye, ya wi rast e; wê gavê ezê bibêjim ya min ji rast e. Têkiliya kumîk bî gramerê re tune. Dîvî mutleqa em ji alfabeyê dest pê bikin. Lî lez ji mekin. Yênu ku li Ewrûpa dîminin, dê wîsa bî hêsanî nikaribin dev jî qaideyêن xwe berdin. Lî gora min, wext derbas bûye. Jî xwe mexsed ji işaretê, dengan jî hevdû qetandin e."

Niviskarê rojnameya Welat Zana Farqini di peyivina xwe de weha got: "Heke iro em pêsi li xebatê li ber guhertînê bigirin, sibê emê pêsi li ber guherinê dî pirsa gramerê de ji bigirin. Heke em, yênu ku li welat dijin li hevdû bikin, dê yênu derva ji nêzikayi li van guhertinan bidin. Hin zimanzanê me di vê pirsê de tinazan bi hevdû dikin. Lî belê mesele mesela tercihê ye. Tu dengan li işaretan bar diki. Dîvî ku em şikîn siyasi deynin aliyeke û li gor vê yekê tevger bikin."

Berpîrsiyarê Kovara Nûbiharê Sabah Kara di axaftina xwe de weha got: "Em wek Kovara Nûbiharê rûmeteke mezin didin xebatê sazgehi û enstituyê. Heke di bin pêşkêsiya enstituyê de guhertînek çêbibe, emê vê guhertînê bipejirinin û di kovara xwe de bixebitinin. Lî belê, ez dixwazim disa di derheqê "ê" yê de çend tiştan bibêjim. Herweki tê zanîn, di hemû klawiyan de "Ê" (Ê ya Fransizi) heye. Di cihê "ê" yê de, em dikarin ji vê "Ê" yê istifade bikin. Heke me kumîk li ser "î" ji rakir, dimine "û". Li gor ditina min, ev "û" ji ne problem e û di zimanê Farisi û Kurmanciya Jêrin (Sorani) de nayê bîkaranin; ciyê xwe ji "o" yê re dihêle. Em dikarin vê yekê ji bo Kurmanciya Jorin ji bîkarbinin. Lewra ji xwe "û" di zimanê me de kêm e. Em bi "o" yê dikaê rin ciyê wê ti je bikin."

Serokê Enstituya Kurdi Şefik Beyaz ditinê xwe bi vi awayi ani ziman: "Ez besdari ditinê weki ku Enstituya Kurdi di pirsa alfabeyê de acele kiriye nabim. Lewra beri her tiştî pêwist bû ku me ji alfabeyê de dest pê bikira. Rexneya ku me bang li kesen ku di vê mijarê de xebatê wan hene nekiriye ji, ne durûst e. Heta ku jî destê me hat, em bi kesen ku di vê pirsê de xebatê wan hene re ketin têkiliyê; me wan vexwend civinê û me got heke nikarin besdari civinê bibin, bila ji kerema xwe re ditinê xwe yêli ser alfabeyê ji me re bişinin. Iro em vê meselê çiqas hewaleyi dema pêş bikin, dê ewqas problema me girantir bibe. Lî belê em di vê pirsê de ji lez nakin. Di demeke pêş a nêzik de disa emê li ser vê pirsgirêkê çend civinê din çêbikin. Ew kesen ku li Ewrûpa dîminin, nikaribin werin welat û ditinê xwe ji me re neşinin, emê herin li Ewrûpa civinan çêbikin. Em dikarin bibêjin ku di van herdu civinan de meyleke giştî çêbûye. Ev meyl ji guhertina "î" û "î" ya Kurdi ye. Tu têkiliyek vê guhertînê bi dengên alfabeyê re tune. Lî disa ji ez dibêjim, emê di vê pirsê de lez nekin. Ez bawer im ku emê bi awayeke zanisti, bi metodê hev ser-wextkirinê, çareseriyeke ji vê pirsgirêkê re bibin. Armanca me pêşvebirina zimanê Kurdi ye."

25.08.93 / Stenbol

DİTİNÊ REDAKSİYONA ROJA NÛ LI SER ALFABEYA KURDİ

Gengeşîya derbari mijara "Alfabeya Kurdi", ji nû va hin hêvi û daxwaziyêne pêşerojê ani rojevê. Jî ber vê yekê em, xebata Enstituya Kurdi dî cih da û gavek pêş dibinin. Lî divê bête zanin ku, ev gengeşî beri we ji hebû û dî kovarêne Kurdi yên dervayi welat da ji hatine nivisin û munaqeşekirin.

Me, wek Roja Nû, ji destpêkê alfabe û gramera C. Bedîrخan wek otorite pejirandîye. Lî dî pirsa "1-i" da me rastiya gelê xwe (ku van tipan bî hêsanî dikarin bîxwinin û bînîvisin) û riya hêsanîyê daye pêşberî xwe. Ev, realiteyek e û wîsa dixwaze. Munaqeşeyâ ku iro Enstituya Kurdi vekiriye û ditinê beşdaran vê realiteyê baştı tine ziman. Lewra ew bî xwe dî nav gel da ne û belki ji me nêztir pîrsen gel (derbari alfabeyê da) nas dikin. Me, ji bo alfabeyek yekgirti yan ji standard bî berpîrsiyari hereket kîriye û em ê ji niha pêva ji bikin.

Qonaxa ku iro gelê Kurd gîhiştiyê, êdi dî hemû mijarêne jiyanê da otorite, serûberi û standardi dixwaze. Rast e, hin tişt hene ku

girêdayi saziyên dewleti ne. Wek otoriteya siyasi, cîvaki, sosyal, çandi û hwd. Lî hin tişt hene bê wê (dewlet) ji, dikarin ji niha va bîbin standard û ji pêşerojê ra bîbin bîngehek qewi. Yek ji wana ji, pîrsa alfabeya Kurdi û çareserkirina hin pîrsgirêkên bîçûk in. Bêguman alfabe tenê bî serê xwe zimaneki standard peyda nake, lî dî zimanê niviski da bîngehek gîring e.

Tarixa alfabeya Kurdi ya latini û xebata Celadet Bedîrخan tê zanin, disa hatîye xuyan ku, Kurd ji gelên derdora xwe kîmtir ninbûne. Lewra Celadet Bedîrخan hêj dî sala 1919 an da dest bî afirandîna alfabeyek latini kîriye. Ev xebata piroz dî sala 1932 da gîhiştiye qonaxa dawi û dî Hawarê da hatîye çapkîrin. Disa tê zanin ku dewleta Tîrk dî 1927 da, bî alikariya zîmanzanêne Awrûpi derbasi alfabeya latini bûne!.. Ew tipen latini yên ku bî kar anine ji, ne malê wan bî xwe ye û hemû tipen ku iro têن bîkaranîn ji der hatîne wergirtin. Wergirtina tipan nabe sedemê kîmasiyê. Ne ji bo Tîrkan ne ji ji bo Kurdan!.. Herweha alfabe

û tipênu ku iro em bî kar tinin ji, ne afirandineke zanyarênu Kurdu bî xwe ye. Bi gotineke din, ne tipênu nediti û nebinahi ne!..

Bêguman ew pirsênu alfabeaya Kurdi yên ku Enstituya Kurdi tesbit kırine, kêm zêde têna munaqesekirin, lê li gor raya me munaqeseya heri mezin li ser xala 7 an e, ango li ser "i" û "î", "ı" û "ı" ne. Jî bo me xalênu din tu sergêjayı peyda nakin û her wîsa li dervayı welat li ser wan xalan (bli xala 7) ji munaqese nine. Derbari rastnivisinê hin munaqese hene lê zêtir ev munaqese dikeve mijara gramera Kurdi.

Eger em yek bî yek li ser hemû xalan ditinênu xwe diyar bikin, wê gelek ditin dubare bibin. Dêlva wi da em ê li ser xalênu pêwist bisekinin, cih bî cih li ser hin ditinan rawestin. Ditinênu me yên çar sal berê (ku di sala 1989 an da di hejmara Roja Nû da hatine pêşkêskirin) û iro wek hev in. Jî ber vê yekê heta jî destê me bê em ê ji dubarekiranê birevin.

1- 2 : Zêdekîrin û kêmkirina dengênu alfabeyle:

Em zêdekîrin tipênu alfabeaya Kurdi di cih da nabinin û emin in ku tipênu heyi bersiva hemû dengênu bingehin ên zimanê Kurdi didin. Lewra zêdekîrin tipan ne marifetek e, berevajiyê wê, kêmkirin û hêsan Kirin marifet û ilmi ye. Ew marifet ji, ji ali C. Bedirxan va gelek bî zanyari hatiye nişandan. Ev xalênu ku Enstituya Kurdi kiriye rojeva xwe (pirsa "ı - i" ne tê da) bî salan di rojeva C. Bedirxan da ji maye ta ku gîhiştiye çareseriyeke ilmi. Zêdekîrin tipan ji afirandina dijwariyan pêva tiştek bî xwe ra nayne. Ango di dêlva çareseriyê da em ê pirsgirêkên nû peyda bikin. C. Bedirxan bî xwe ji, di destpêkê da 36 dengan çêkiriye, lê rastiya gel, hêsan Kirin xwendin û nivisandinê daye pêş çavan, ji tecrubeyen gelên din kelk (feyde) stendiye û lewma ji li ser 31 dengan bîyâr daye. Rastiye din ji, tu zimanزانek li gor hemû dengênu ku di zimaneki da hene tipan çênekirina, lê dengênu bingehin tesbit kırine û çareseriya dengênu mayin ji, ji xwendinê ra hiştine. Lewra hêsan Kirin xwendin û nivisandinê argumenta sereke ye. Di tu

zimaneki da dengkirin û nivisandin ne sedi sed wek hev in û her wîsa hemû dengênu ku di axaftunê da tênu bîhistin nîkarin bibin sedemê çêkirina tipan. Wek ku C. Bedirxan ji dibêje, "welê bûya dîviya bû elfabeaya her zîmani ji 50-60 herfan hevedudani bîbe".

Jî bli 31 dengênu Kurdi du dengênu ku bî eslê xwe biyani ne, hene, ew ji dengênu 1- "H" yê ku ji gewriyê tê dengkirin, wek: Heqib, hine, hîşk... 2- X yê ku hînek qalind tê dengkirin, wek: Xar, xafîl.. C. Bedirxan li ser van dengan weha dibêje : "Jî van pêve du herfîn biyani hene ku birek ji Kurdu wan dibêjin. Lewre ku ew herfîn ha di eslê xwe de ne Kurdi ne. Me ew ne êxistîne nav elfabeaya xwe. Ew ji (Z) û (Z) ne, me ew herdu herf bî danina du deqan ser "h" û "x" nişan kırine. h - hal.....x - xar. Ku ev deq ketin ev herfîn ha vedigerin ser herfîn Kurdi û dibin "h" û "x". "

Lî gor raya me ev pirs, çareseriya xwe di xwendinê da dibine û zêdekîrin ne pêwist e.

Herweha em kêmkirina dengênu alfabeyle ji, di cih da nabinin. Lewra dengênu bingehin, 31 dengênu tesbitkirine û nayê avêtin, Eger hin varyantên çend dengênu esli hebin ji, ji bo wan varyantan çêkirina tipan pêwist nake, lewra ew deng cardin vedigerin ser cihderka dengênu esli.

3- Avêtina hin kumik û niçikan:

Bersiva vê pirsê di destûra alfabeaya Kurdi da hatiye dayin. Bînihêre, bersiva xala 5 an û li benda destûra alfabeaya Kurdi ya 5 an.

4- Di alfabeaya Kurdi da bikaranina tipênu Tîrki :

Jî nezani yan ji quesdi têkelkirina tipênu Kurdi û Tîrki, ango di dêlva "x" da "g" yê Tîrki, di şûna "u" yê Kurdi da "ü" yê Tîrki, di şûna "û" Kurdi da bikaranina "u" yê Tîrki xeterekî mezin e û dîvî bî tu awayi tolerans nebinin.

5- Jî bo dengênu "ç,k,p,r,t" bikaranina tipênu cihê:

Lî ser vê mijarê argument û pêşniyarênu berbiçav û ilmi tune, yan ji nehatine xuyan.

Ango dî dêlva "ç,k,p,r,t" da kijan tip hatine pêşniyarkırın, kifş nine?.. Eger pêşniyar hebin ji, lî gor raya me guhartina tipên jorin ne di cih da ne. Dî ilmê zîmanzani da alfabe tenê nişanên dengan in, ne rengê wan. Jî wê yekê ji bo nişankırına dengeki, ji şikil û formen alfabeteyê ra sinor an ji qaydeyek kifşkiri tune ku karibe meriv girêde. Lewma ji yê giring ew e ku, di zîmaneki da dengen bingehin bêne tespitkirin û ji her dengeki ra tipeki bête çekirin. C. Bedirxan yek bi yek lî ser dengen Kurdi radiweste, dengen Kurdi û zîmanen din rûbari hev dike, dî nav cûre cûre kategoriyen gel da sehitiya dengkirina dengan dike û her weha digihije encama iroyin.

Eger pirs, ji hev cudakırına dengen bi aksan û bê aksan be û ji bo cudakırınê bikaranina apstrof (') an ji serxet (-) û binxet (_) be, em ligel parastina alfabetaya C. Bedirxan in. Himdarê alfabetaya Kurdi, vê pirsê dî destûra xwe da baş daye xuyan:

"V- Herçend heye, ji barkırına herfan bi nişanen nû, xwe dan ali.

Nışan ji hêlekê dî nîvisandinê de bi vegera qelemê wext dide windakırın. Jî hêla dîn bi jibirkırına nişanê herf vedigerin ser şiklén xwe yên esli, bênişan û tevlihev dibin. pejirandina çend nişanan bi hev re ev ji dijwarike din e. Jî lewre ji bona tevayıya herfên binişan me ev (^) pejirand û navê bilindek lê kîr. Jî ber ku dengen herfan hem dijuherine hem bilind dike, û ji nişanen wek (. - , - ') qenc têt vegetandin."Jî xwe boşbûna (pirbûna) nişanan nîvisandinê kîrêt dike."

6- Dî zîman da bikaranina diftongen zêde:

Wek tê zanin, diftongen zêde tê mana bikaranina du dengdêren hevedudani. Ango dî dêlva herfeki da bikaranina du herfan. Em pêwistiyek weha nabinin û dîgel parastina alfabetaya heyi ne. Jîxwe bersiva vê pirsê, dî destûra alfabetaya Kurdi ya C.Bedirxan, dî xalên 3 û 4 da, gelek vekiri hatiye rawekîrin:

"III- Nişankırına her dengi bi herfeke serxwe û ji awayê herfên hevedudani xwe dûr xîstîn.

Bê şik e ku hinbûn, xwendin, nîvisandin û lêkdana herfîn serxwe ji yê hevedudani hêsanter e.

IV- Her dengi bi herfeke cihê nişankırın, yani ji awayê nişankırına çend dengan bi herfeke an dengeki bi çend herfan, xwe dan ali.

Ev awa ji fikra çêkirinaa elfabekê bi hindik herfan an ji quesda qenc lisersekinandina denganiyê dikare bizê. Lî pê herdu ji nakevin dest û dî zîmani de bila sebeb pîrsinê dî şikli de ciyok peyda dibin û dî nîvisandinê de tevlihevike mezîn berpê dibe.

Jî xwe dî tu zîmani de dengani (dengkirin) û nîvisandin ne lêvîn yek in, û nîvisandin nikare bi tevayı lî denganiya wi zîmani bê. Lewre ku kitkit û rengên denganiyê bi elfabeteyê nayen nişan kîrin û lî ser kaxezê sekînandin. Welê bûya diviya bû alfabetaya her zîmani ji (50-60) herfan hevedudani bibe."

7- "i - î" ya Kurdi wek "i - i" ya Türkî nîvisin :

Jî pîrsen ku hatine tesbit kîrin, zêtirin munaqeşe lî ser bikaranina "i - î" yê Kurdi û "i - i" yê Türkî ye. Ev herdu şikil ji iro têr bikaranin. Bikaranina "i-i" yê Türkî dî şûna "i-î" yê Kurdi da, dî salên 60 i da cara yekem ji ali Dr. Şivan (Seid Kîrmîzîtoprak) va hatiye bikaranin. Jî salên 1975 şûnda "Özgûrlük Yolu" (Riya Azadi) û Roja Welat ji dî warê çapemeni da "i-i" bi kar anine. Ev tercîh heta salên 1982-83 ji, ji ali piraniya kovar, rojname, weşanxane, nîviskar û hwd. dom kîriye.

Gelo çi bû û çi qewimi ku hin kovar, rojname û kes dev ji nîvisina "i-i" berdan û dest bi "i-î" kîrin? Argumenten vê guhartînê çi bûn? Lî gor raya me heta iro ji, bersiva vê pîrsê ne-hatiye dayin. Bêguman hin argument an ji rawe hene, lê çi derece xwedi tesir in?.. Maqûliya hêsanîya heyi çi derece hêsanter kîrin? Dî dawiyê da derdorênu ku "i-î" tercîh dikin, xwe davêjin piş Celadet Bedirxan û rêçika wi ji xwe ra dikin mertal. Em bi xwe ji spasiya wi zanyarê mezîn dikin, ku vi alfabetaya

delal çêkiriye. Lî baş tê zanin ku, C. Bedirxan bî xwe dî destûra alfabeaya Kurdi da çiqas ji bo hêsankırına alfabeleyê û nêzikkırına alfabeaya Tîrki cehd kiriye, ji guhartûnê pêwist nereviyaye. Ya duduyan, tu gramer û alfabe piroz nînin û dema ku serûberi, guhartûn pêwist bîbe dîvê meriv bike. Lewra dî warê zimanzaninê da, teknik, ilm roj bî roj pêşda diçê.

Me li jorê behsa hin argument an ji ditinan kîr. Derbari pîrsa "i-i" yan "i-i" da çend ditinênu kû zêtir dertên pêş ev in:

1- "î"yê Kurdi wek deng dirêj e, "î"yê Tîrki kurt e ji ber vê yekê nabe ku meriv "î" Tîrki bî kar bine.

2- Dîvê "î"yê Kurdi ji "î"yê Tîrki cudatir be.

3- Celadet Bedirxan alfabeleyê weha daniye, dîvê meriv dest nedê.

4- Eger em dî şûna "i-i" yê Kurdi da "i-i" yê Tîrki bî kar binin, em ê ji rihê Kurdi dûr bikevin.

Dirêjahi û kurtiya dengeki, rengê deng e, ne forma nîvisandi ya ser kaxiz e. Lewra yê gîring ji bo dengeki, hilbijartûn an ji çêkiriya tipêk e. Wek "î" yê Kurdi, dî hin zimanê Ewrûpi da ji, "î" dirêj tê dengkirin, wek minak, dî zimanê Swêdi da "î" dengeki dirêj e, lê Swêdiyan ji bo dirêjbûna vi dengê wek me bîlîndek (^) bî kar naynîn. Armanca C. Bedirxan bî xwe ji, tenê bikaranina tipên latinî bûye da ku zimanê Kurdi bî hêsanî bête xwendin û nîvisandin. Bêguman du tipên me yên istisna hene, ku bî niçik hatine nişankirin, wek "ç" û "ş". Sedemê bikaranina niçikan ji, ji ali C. Bedirxan va hatiye rawekirin, ku dî zimanê Kurdi da tipên hevedudani neyên çêkîrin, lewra zimanê Kurdi zimanîke fonetik e û çawa li ser kaxiz tê nîvisin wîsa ji tê xwendin. Bî kurti bikaranina "î"yê latinî dî şûna "î" yê Kurdi da, hêsanît e û em wi tercîh dikin. Ü çîma em ê xwe ji dînyayê û gelên ku alfabeaya latinî bî kar tinin bikin? Çîma em ê

xwe ji standardek dînyayê veqetinîn?..

Destnedana alfabeaya C.B. an ji neguhartûn, ji rastiya ilm ji û ji rastiya gel ji dûr e. Eger pêwisti hebe dîvê meriv ji çareseriyê nereve. Lî gor raya me bikaranina "i-i" Tîrki xwendin û nîvisandina Kurdi hêsanît dîke û piraniya gel ji, çavnasê "i-i" ne û bikaranina wan tercîh dikin. Û dîvê neyê ji birkirin ku, C. Bedirxan bî xwe ji hin guhartûna çêkiriye. Rastiyeke dîn ji, C. Bedirxan, heta ji dest hatiye alfebeya Kurdi nêzi alfabeaya Tîrki kiriye :

"1- Jî van niqtan pêve ku xasê denganiya zimanê Kurdi ne, dî şîklî û dengê herfan de, herçend heye, xwe ji alfabeaya Tîrkan nizing xîstün û jê dûr neketin. Armanca elfabê sekînandina dengen li ser kaxezê bî şîklan e, şîklî bî herfan têni nişan kîrin, û herf qebalewi û bîhemd in. Jî lewre nişankirina dengê () bî "c" û yê () bî "ç" û bî hevguhartûn û cihguhastina wan wekhev û bêferq e.

Lê bî vi awayi Kurdêne welatê jorin û heci ku alfabeaya Tîrki dînasîn dê bikarîn bê dijwari ya Kurdi hin bîbin û komel û kîtêbêne me bî hêsanîti bixwinin."

Bî kurti em ne ligel guhartûna alfebeya C. Bedirxan in. "i-i" ne tê da. Ev guhartûna hanê ji, lî gor mantiqa C. B. e, ku dî xalêne destûra alfabeleyê da hatine xuyan.

Jî bo me çareserkirina pîrsan, xebat û lêkolineki ilmi dîvê. Eger çareserkirin ji çarçeva ilmi derneyê em pê ra ne.

Bî silavêner germ dî xebatêne we yên hêja da serketin dixwazin.

Redaksiyona Roja Nû



HELBEST

Kurdo roja te bî xêr

Rojê avêt bî hawêr
 Tavê xwe da jor û jêr
 Kûrdo roja te bî xêr
 Bîkev çerxa cihanê

Sosını rengê gul i
 Bî reyhan û sînbîl i
 Mîrad nedit vi dîli
 Ser ax a gûlistanê

Tû guli gulan veke
 Sosin û reyhan veke
 Ber bihn û renge xweke
 Ew gûl û gulistanê

Agîr bî êvarê ket
 Tav a bî zinarê ket
 Mîzgin bî bîharê ket
 Bî sosin û reyhanê

Lî bin dara Azadi
 Me qet nedî şûnd û cih
 Édi besse koleti
 Bî ber zor û lêdanê

Vaye hatin Kurdên nêr
 Dîl pîling û pençê şêr
 Govend girtin jor hu jêr
 Kêf û şaya dilanê

Ez Ezmanê Kari me
 Lî ser koka Ari me
 Hîrcû gûra xwerime
 Bî ber berf û baranê

Ezmanê Kari

Xwarin xwarin têr nexwarin

Rûniştine lî Enqerê
 Can xistîne vê bazarê
 Xwê ya me her carê
 Xwarin xwarin têr nexwarin

Karker cotkar bûne kole
 Kîras pine, ling bê sol e
 Zeviya axê xwina pale.
 Xwarin xwarin têr nexwarin

Ketin nirê diktatoran
 Rûvi girtin berdan şêran
 Xwiya enya me karkiran
 Xwarin xwarin têr nexwarin

Dînê dane ser mîlê me
 Nafikîrin vi halê me
 Çav berdane vi nanê me
 Xwarin xwarin têr nexwarin

Ketin nirê beg û miran
 Em girêdan bî zînciran
 Canê me xwar wan xinziran
 Xwarin xwarin têr nexwarin

Qîmîl karket lî Enqarê
 Kurman girti pelê darê
 Ard nehiştin lî ambarê
 Xwarin xwarin têr nexwarin

Tû qîmila rû ezmanan
 Tû tîrtûlêñ nav zozanan
 Xwarin mala me nezanan
 Xwarin xwarin têr nexwarin.

Ezmanê Kari

Mankan Pis

Minalêki xinjilane
le mal derçû û
rêgay gêrranewey wîn kîrd
duway ewey ke dozrayewe
le naw cergey Broksil da
peykerêkiyan bo dîrûst kîrd
bellam lêre
lem wîlate ser be teme
hemû rojê gorri meng
bo hezaran saway çaw reş
helldekenin
Keçi hêşta dellên keme!

Enwer Omer

Duwa fişek

Fîsekeke zerd hellgirra û
be xurr fîrmêski hellderrişt..
Ke pêşmergeke lêy pîrsi
bo çi degrit ?!!
gûtu mîn demwist ser dîli
duşmînêkîm pê bîpêki
nek dîli xotîm pê bîsmît..

Enwer Omer

Sixwîr

Laşeyekim
le gûveki derewey dê
tûrr dîrawîm
çendin sal e
segêk limozi nexîste kelakekem
gendexorekanış gêziyan bîm xon
tenanet pire gûrgêki bîrsi û mandûş
bonmi nekîrd..!
Cûnke ewrojey ke hatîm
dar û perdûi em gundeyan gîrr tê berda
mîn piştîm bo kîrdin be pîrd..

Enwer Omer

Pêşniyazek ji
niviskarê kurd
Memed Emin Bozarslan:



Bila sala 1995'an bibe "Sala Ehmedê Xani û "MEM Û ZİN"ê

UPPSALA, 21/09/1993

Jî hemi vêkxistinên Kurd
êñ siyasi, çandeyi û komeli ra
nameya vekiri:

Serok û kargêr û endamên berrêz,

Wek ku tê zanin, Destana Netewi ya
Kurdi "MEM Û ZİN" di sala 1995'an
da 300 saliya xwe dadigre. Hozanê
nemir û birewerê gewre Ehmedê Xani,
nivisina vê destana rûmetgiran di sala
1995'an da temam kîriye û paşê ji ew
wek miraseka neteweyi ji neteweyê
Kurd ra hiştiye.

Ez dixwazim bî kîfxweşi û bextyari bî
raya gîsti ya Kurd bîdîm zanin ku, ez
ji despêka sala 1992'an vir ve lî ser
"MEM Û ZİN"ê dixebeitim û wê ji

çapeka nû ra amade dikim. Amanc û
daxwaz ev e ku ez çapa wê ya nû beri
Newroza sala 1995'an bigihinim destê
xwendavê Kurd. Ez dixwazim vê yekê
ji bîdîm zanin ku, mîn "MEM Û ZİN"
wergerandiye Kurdiyeka xwerû dê
pêkve bêñ çapkırın û lî rexê hev ci
bigrin. Bi vi awayi, xwendevanê Kurd
dê bî Kurdiya xwerû imkana xwendîna
wê û têgihiştina naveroka wê bibine.

300 saliya "MEM Û ZİN"ê jîbo me
Kurdan bûyereka gelek gîring e. Di
dirokên hemi netewan da bûyerên
weha ciyeki pîrr gîring û bîlind
digirin, bi civin û şenayiyêñ mezin
têñ pirozkırın. Biranın û pirozkırına
salvegerên weha giyanê neteweyi xurt
dike, bîngehê hevgîrîtna neteweyi
zexm dike, têgihiştina neteweyi ji fîre
dike. Eşkera ye ku ihtiyaca me Kurdan

jî hemi netewyên di pîrrtir bî biranîn û pirozkırna salvegerên bûyerên neteweyi heye.

Mîn, wek niviskareki Kurd ê ku lîser "MEM Û ZIN"ê dixebite û wê jî çapê ra amade dîke, dî tarixa 21 Adar 1992'yan da jî UNESCO ra nameyek nîvisi û ú û pêşniyaz kîr ku UNESCO sala 1995'an "Sala Ehmedê Xani û MEM Û ZIN"ê ragihine û bî vi awayi piştgiriya xwe jî çandeya Kurdi ra nişan bîde (ez fotokopiyêن wê nameya xwe ya jî UNESCO ra ji dî gel vê nameya xwe ya jî kovar û rojnameyêن Kurd ra dışinim û bî vi awayi cara pêşin jî raya gişti ya Kurd ra eşkera dikim û hem bî vêkxistinêن Kurd, hem jî bî raya giştiya Kurd radigihinim).

Lê belê UNESCO heta nuha pêşniyaza mîn qebûl nekîriye, tewr bersiva nameya mîn ji nedaye. Semedê vê yekê ji ev e ku dewleteka me Kurdan a xweser tune; UNESCO ji vêkxistinêka dewletên xweser e, ku endamên Nteweyêن Yekbûyi ne.

Lê belê em Kurd bî xwi dîkarin vê wezifeya neteweyi pêkbinin û sala 1995'an "Sala Ehmedê Xani û MEM Û ZIN"ê ragihinin û lî gora girîngiya wê, wê bî konferansan, bî semineran, bî cîvinêن çandeyi, bî şenayiyêن folklori û wd. piroz bikin.

Eşkera ye ku ev kar ji tenê bî destê vêkxistinên Kurd ên siyasi, çandeyi û komeli tê pêkanin; bî peyveka di, tenê vêkxistinên Kurd dîkarin vê wezifeya neteweyi bernameyêن pêwist amade bikin, wan bernameyan pêkbinin û bî wi awayi girîngiya 300 saliya "MEM Û ZIN"ê bî kitleyêن gel ragihinin.

Bî vê amancê û bî dileki tiji hêvi,

mîn bîryar da ku ez vê şolê bî vêkxistinên Kurd bîdîm zanîn û vê pêşniyazê jî wan ra pêşkêş bikim. Jî ber ku imkanêن mîn tunîn ez xwe bigihinim vêkxistinên Kurd û vê pêşniyaza xwe yekser bigihinim wan, ez vê nameya xwe ya vekiri digel nameya xwe ya Ingilizi ya jî UNESCO ra jî kovar û rojnameyêن Kurd ra dışinim û dixwazîm bî riya wan, bî navbercitiya wan, bî hemi vêkxistinên Kurd ên siyasi û çandeyi û komeli ragihinim.

Ez, wek niviskareki Kurd ê ku lîser "MEM Û ZIN"ê dixebite, lî hemi vêkxistinên Kurd ên siyasi û çandeyi û komeli pêşniyaz dikimû jî wan tika dikim:

1- Sala 1995'an bî navê "Sala Ehmedê Xani û "MEM Û ZIN"ê qebûl bikin û ragihinin.

2- Bîryar bîdîn ku Newroza sala 1995'an lî Kurdistanê û lî derê welêt bî navê "Newroza Ehmedê Xani û "MEM Û ZIN"ê bê biranîn û bê pirozkırın.

3- Bîryar bîdîn ku 300 saliya "MEM Û ZIN"ê dî sala 1995'an da lî Kurdistanê û lî derê welêt bî konferansan, bî semineran, bî cîvinêن çandeyi, bî şenayiyêن folklori û wd. bê biranîn û bê pirozkırın.

Digel sîpasan, slavan û daxwazêن serketinê

M. Emin Bozarslan

Nameya M. Emin Bozarslan

Jî Unesco ra (*)

Jî Unesco ra

Place fontenoy
75007 Paris
France

21. Adar. 1992

Mehmed Emin Bozarslan

P O Box 3050
75003 Uppsala/Sweden

Ez nîvîskareki Kurd û ji Kurdistanâ Bakûr im (beşa Tîriyê). Ev 13 sal e ku li Swêd rûdînêm. Lêkolin û xebatê mîn nîvîskariya Kurdi, zîmanê Kurdi, literatura Kurdi, folklora Kurdi, diroka Kurdi û wergêra nîvisar û rojnameyê Kurdi yên kevn in. Jî ber bêimkaniya domandîna nîvisandin û çapkirina pirtûkan li Tîriyê, ez mecbûr mam û hatîm Swêd. Li Swêd bî hêsanî û azad pirtûkêna xwe dînîvisim û çap dikim. Heta nîha mîn li Swêd 20 pirtûk çap kîrine. 5 pirtûkêna mîn wek seri ji Fablêna Kurdi yên kevneşopi, û disa wek seri 5 pirtûk çirokêna Kurdi yên kevneşopi pêk têna. Jî xeyni vana mîn careke dîn pirtûka xwendinê ya yekem "Alfabê"ya Kurdi, ku cara yekem li Istenbolê hatîbû çapkîrin û dî 1968 an da ji ali rejîma Tîrk hatîbû qedexekîrin, çap kîr. Ev pirtûka xwendinê ya yekem e ku li Kurdistanâ Bakûr an ji li Tîriyê hatîbû çap kîrin.

Jî bli van pirtûkan, mîn rojnameya Kurdi ya navdar "JIN" ji tipêna Erebi transkripteyi tipêna latini kîr û mîn wana ji nû va wek 5 cild (bi şirovekîrin) da çap kîrinê. Ev rojname (JIN) dî 1918-1919 an da li Istenbola, ku wê hîngê paytextê imparatoriya Osmani bû, hatîbû çap kîrin.

Mîn rojnameya Kurdi ya yekem "KURDISTAN" ji transkripte kîr û ji nû va da çap kîrinê. Rojnameya "Kurdistan" cara yekem dî 1898 an da li Kahirê (Mîsîr) hatîbû çap kîrin û piştre li Isviçre û Ingiltereyê heta 1902 an çapkirina wê dom kîriye.

Epika Kurdi ya Neteweyi "MEM û ZIN"

Dî plana mîn a pêşerojê da hewl didim ku li ser epika Kurdi ya navdar "Mem û Zin" bixebeitim û çap bikim. Ev epik, wek hemû epikêna kevn epikeke zargotini ye û wek serpêhati hatîye gotin. Ev epik bi devki wek stran û çirok li Kurdistanê belav bûye, bi taybeti ji dî gundan da. Dî sedsala 17. an da nîvîskar û hozanê Kurd Ahmedê Xani ihtimal e ku ev epika han ji nav xelkê berev kîriye û cara yekem epik dî forma pirtûkê da nîvisiye. Ahmedê Xani pirtûka xwe ("Mem û Zin") dî sala 1695'an da temam kîriye.

Pirtûk bi naveroka xwe behsa evineke trajik a xweşmêreki Kurd ê bi navê MEM û xatûneke Kurd bi navê ZIN dike. Dî pirtûkê da evina wan dîbe babeta sereke, ku tê da wê hîngê fam û feraset, rewşa

siyasi û rêvebiri, kulturi, kevneşopi, sosyal û rewşa abori ya Kurdistanê dide xuyan; rewşa çin û tebeqeyên wê hîngê û pevgirêdana navbera wan, rewşa rêvebir û yên bin desten wan rawe dike.

Mir, ku bî xwe birayê Zinê bû, guh dide fesadên derdora xwe û dibe asteng li pêşîya zewaca wan û Mem dixe zindanê. Jiyan jî bo Mem û Zin dibe wek cehennem. Mem nikare vi barê bêhêvi ragire û salek şunda dîmre. Zin ji bêçare û xemgin e û nikare bî evineke bêhêvi bijî û herweha ew ji diçe ser heqîya xwe.

"Mem û Zin" û xebata min

"Mem û Zin" bî tipêن Erebi lê bî zimanê Kurdi hatibû nîvisandîn. Rastiyek hebû ku li Kurdistanâ Bakûr kesi nikaribû bî tipêن Erebi bînivise û bixwîne. Ev rewş bû sebeb ku ez pirtûka "Mem û Zin" bî temami jî tipêن Erebi transkripteyi tipêن latini bikim û dî sala 1968'an da li Istenbolê bî alfabeşa xwe ya Kurdi ra bîdim çapkîrinê. Ev pirtûk hate qedexekîrin, lê piştî bî bîryara dadgehê ev berhem disa bî serbesti hate çapkîrin. Piştî hukmê cunta ya 1980 disa bî ferma-na cunta jî ali dadgeha bîlind a eskeri va hate qedexekîrin. Ev berhem, piştî betalbûna hukmê cunta cardîn serbest bû. Dî 1991 da li ser vê berhemê filmek hat çekîrin. Ez bawer im ku xebata min a li ser "Mem û Zin", ku min jî 1992'an da dest pê kiriye, wê dî 1994'an da temam bîbe. Plana min ew e ku, ez şirovekîrineke dûr û dîrêj û hûrditi, bi qasi 100 rûpel, jî bo danasina epikê bi xwe û niviskarê wê Ahmedê Xani bikim. Jî xeyni vi kari, ez ê li ser hemû besen berhemê ditinê xwe bî awayeki hûrditi û hevdem (detaly), wek têbini, rawe bikim û pêşkêşê xwendevanan bikim. Jî ber qedexekîrin û zîlma dewleta Tîrk minê nikaribûya şirovekîrineke weha li Tîrkiyê bînîvisanda û bîda çapkîrinê. Plana min ew e ku, "Mem û Zin" dî 1995'an da bête çapkîrin û dî 21'ê Adarê da

(Newroz), ku roja cejna Kurda ya netewi ye, dî destê xwendevanan da be. Ez bawer im ku wê hîngê wê ev xebat bî Elmani û Tîrki ji bête wergêrandîn û çapkîrin.

"Mem û Zin" çîma weha gîring e?

Pirtûka "Mem û Zin" jî bo gelê Kurd gelek gîring e. Yekem, jî ber ku ev berhem dî literatura Kurdi da serdemêke gîring û sereke li dara dixe. Duyem, derbari agahdariya kultur û tradisyonê (erf û adet) Kurdi da çavkaniyeke dewle-mend e. Sêyem, ev berherma diroki ya yekemin e ku behsa bir û rayêneteweyi dîke û ev mijar dibe çavkaniyeke sereke ji bo nasina huviyeta neteweyi û parastina wê, ziman, kultur, literatur, folklor û muzika wê. Herweha "Mem û Zin" çavkaniyeke sereke û bî rûmet e jî bo lêkolininvanê rojavayı û oriyentalistan (rohilatzan), ku li ser çanda Kurd, kevneşopiya Kurd û literatura Kurd ku lêkolinê dîkin. Jî ber vê yekê jî ev berhem heyîyeke bî rûmet e jî bo neteweaya Kurd û her wîsa jî bo lêkolin-nîvanê ne Kurd.

Salgera sêsedsalîya "Mem û Zin"

Wek ku min berê ji got, nîviskar û şairê Kurd Ahmedî Xani "Mem û Zin"ê dî sala 1695 an da nîvisiye. Ev sal bû ronesan-sek, ku dî diroka Kurd da bû serdemêke bî rûmet. Wek ku jî destpêka nîvisara "Mem û Zin" a Ahmedî Xani tê xuyan, ev berhem jî bo bir û baweriyêneteweyi û belavbûna wi dibe reberê neteweaya Kurd û Ahmedê Xani bî xwe ji dibe wek bavê pêşeng ên ramanêneteweyi. 1995 sêsedsalîya "Mem û Zin" e. Ev salgera sêsedsalîya "Mem û Zin" e. Em Kurd, dîxwazîn vê salgerê li seranseri Ewrûpaya Rojava, Avûstralya, Kanada, USA û eger şert hebin li welatê me Kurdistanê da ji piroz bikin. Pêra jî, dî salgerê da wê bî konferans, seminar,

panel û bî çalakiyêن cuda bête piroz kîrin. Herweha çapa nû ya "Mem û Zin" wê ji bo xwendevanan ji bîbe salgera sêsedsalîya "Mem û Zin".

Meyla UNESCO li ser Kultura Kurdi

Zimanê Kurdi, kultura Kurdi, literatura wi, folklor û muzika wi dî bîn tehdit û zîlmeke gîran a dewleta Tîrk da ye, ku ideolojiya dewleta Tîrk a fermi Kemalizm e. Pîşti damezrandına komara Tîrk (1923), hemû heyiyêن Kurdi hatin qedexekirin - ziman, kultur, folklor, muzik. Bî serda rejima Anqerê ya kemalist peyva Kurd û Kurdistan ji qedexe kir. Ev rejim dî şûna navê Kurdistan da navê "Anadola Rojhîlat" (Doxû Anadolu) û ji bo Kurda ji navê "Tîrkên Çiya" bî kar ani. Ev rejim bî awayeki xwinxwari zîlî û zordariya dewletê bî kar ani da ku kultur û identiteta (huviyet) neteweya Kurd ji holê rake.

Ez wek şexsiyeteki Kurd û wek nîvîskareki Kurd his dikim û pêwist dîbinim ku bêjîm, Kurd hêvi û gumanêm ku ji Unesco, ango ji saziya kulturi ya heri mezîn li dînyayê dikirin, nehatîye bî cih anin û ev rîwş dî nav Kurdan da bûye sedemê şikandına hêvi û gumanan. Unesco li hember êrişen faşist û nijadperest ên Kemalist, li hember zordariyêne insani û anti-demokratik ranewestiyaye û ji bo piştgiri û parastina kultura Kurd tu tişt nekiriye. Unesco, carek be ji, li hember vê politikayê ranewestiyaye û wê rûreş nekiriye. Berevajiyê wê, dî 1981 'an da Unesco beşdarê merasim û konferansên rojbûyîna sedsalîya Kemal Paşa bû (ku bî navê Ataturk tê naskirin, ango mana wi bavê Tîrka ye), ku ev merasim ji ali cunta eskeri va hatîbû organizekirin. Ev tewr û hereketa Unesco, hestêne neteweya Kurd bîrindar kiriye. Kulturzan, nîvîskar, hozan, artist, muzikvan, stranbêj û rojnamevanên Kurd bî tewrê Unesco gelek xemgin û ecêbmayı mane, lewra ev tewr û hereketê Unesco ji

çarçeva xebatê Unesco dertê û jê raters dîkeve.

Tikayek ji Unesco

Em Kurd neteweyek in, ku dî vê sedsalêda bî zîlî û zori ji dervayî irada xwe hatine parcekirin. Welateki me heye lê dewleta me tuneye. Identiteke me heye lê wek fermi dî nav milet û civata dînyayê da nayê naskirin. Kultueke me heye lê temsilkarêne me dî Unesco da beşdar nine.

Tevi van neheqîyan ji, em xwe wek malbatek miletan dîbinin û hêvidar in ku em ê rîxistina kulturi ya dînyayê ji, dî pirozkirîna salgeriya sêsedsalîya "Mem û Zin" da li gel xwe bîbinin. Ji ber ku dewleta me tune, konsolosêne me ji tune û herweha temsilkarêne me yên Unesco ji tune, ji ber vê yekê em nikarin tîka xwe bî awayeki fermi û rîyên diplomatik bîdin xuyan. Lî li gor baweriya me kultur mîrateke hemû mîrovatiyê ye, ku ne tu tixûban ne ji rîyên diplomatik nas dîke.

Ji ber vê yekê ez wek Kurdeki nîvîskar, ku li ser "Mem û Zin" dîxebitîm û dîxwazîm ji nûva di destpêka 1995 an da çap bikim ku ev ji rasti salgera sêsedsalîya "Mem û Zin" tê, ji Unesco tîka dikim ku sala 1995'an wek "Sala Ahmadê Xani û Mem û Zin" êlan bîke. Bî vi awayi ji, wê Unesco karibe bide nişandan ku bî awayeki vekiri piştgiriya kultura Kurd dîke. Bî vi rengi wê bî rasti bide xuyan ku Unesco rîxistina kulturi ya hemû dînyayê ye û ne tenê alikariya kulturên xwedi dewlet dîke, her wîsa piştgiriya kulturên bêdewlet ji dîke. Ez bî hêvi me ku dî pêşerojê da wê Unesco vê bîryara diroki bistine û ez ji nîha va spa-siya xwe pêşkêsi wan û xebatê dikim.

Bî sîlav û hurmetên germ
Mehmed Emin Bozarslan.

(*) Name ji ingilizi hatîye wergereandin.

MEM Ü ZİN

wek radyo-dramatik - 5

ROLËN DRAMATÊ

MEM: Zirkurê Alan Paşa

ZİN: Dota Mir Seydin

QISEDAR (MÊR): QM

QISEDAR (JIN): QJ

HESP

QERETAJDİN

ERFAN

ÇEKAN (Çeko)

BEKIR (Beko)

DOTA BEKO

Radyodramatizekîrin:

ROBERT ALFTAN

Wergerandin ji swêdi:

Xalit Lezgin

(Berdewam ji hej.36)

QJ

Sıwar tev bî rêketin çûn, paşê Bekirê Ewan da dû wan. Dî rê da rasti Mem û Zinê hat. Herdu evindaran bî destê hevdu girtibûn û diçûne nav baxçeyên nependi.

BEKIR

Mem û Zinê xwe bî dizi berdane nav baxçeyên nependi yê Mir. Dîvê Mir wan bî hev ra li wêderê bibine. Bila bibine da ku wan bavêje zindanê.

ZİN REMILDAR

(Bî qûma hûr fal vedike) Mem û Zin hevdu hemêz krîne. Kêf û henekan dikin, kêf û henekan dikin... Ewreki reş, ewrê baranê, ewreki reş, ewreki baranê...

BEKIR

Mirê mîn , ewreki reş ber bî aliyê me va tê. Xuya ye ku lehzeki şûnda baran wê bibare.

SEYDİN

Erê. Wîsa xuya dîke. Dî ezmaneki sayı da ewreki reş.

BEKIR

Em xwe bîdîn ber taldê daran dî baxçeyê we yê nependi da. Bila em şîl nebîn. Qaseki beri niha mîn dit du xezalêñ ciwan ketin nav wan daran. Em wan li wêderê bigrin ji we ra fravinekê hazır bikin heta ku baran sekini.

SEYDİN

Qeretajdin, Erfan, Çekan, hevalêñ mîn ên nêçirê. Werin em bajon nav baxçeyê nependi,

çimki Bekir ditiye ku du xezal ber bî wi ali va
çûne.

(Dî wê gavê da)

MEM

Zinê, axır em dî baxçeyeki da disa gihiştin
hev. Lî vêderê tu kes nikare me bêhizûr nake.

ZIN

Memê hevditina me dîrêjtür e ji çend şaetên
kurt ên şevan.

MEM

Niha hingûra sibê wê me ji hevdu neqetine.
Em ê bî hevra bin, heta ku bavê min û begêñ
Cizirê ji nêçirê vegeerin.

MEM

Lî vê derê, dî binê vê darê da. Xwe dîrêjke li
ser qapûtê min ê fire.

ZIN

Memê, gelo şabûn û dîlxweşiya me wê li vir
biqede? Ez nîzanim, carna ramanêñ xîrab têne
hişê min...

MEM

Zina delal, ma ki bixwaze bî me ra xîrabiyyê
bike?

ZIN

Memê binihêre! Ewreki reş li rûyê ezmana!
Guhdari bike! (Effekt.)

MEM

Sîwar in. Nêzik dibin.

ZIN

Memê, em xwesiri ne. Yek dixwaze evina me
ji ortê hiline.

MEM

Xwe veşere. Zû bîkeve bin qapûtê min.

QM

Dema mir ji derê baxçe kete hundır, destê xwe
bilind kîr û silav da Memê.

SEYDÎN

Slav lî te Memê Alan.

QM

Memê silava mir lê vegerand, lê ji ber wi ra-
nebû ser piyan.

MEM

Slav mirê min!

BEKIR

Mirê min, kî ditiye dema ku mirek bîkeve
hundır silavê bîde xulamê xwe û xulam ji qet
ji ber ranebe? Memê, heke xulam nexweş bin
ji disa radibin. Zû rabe ser piyêñ xwe!
Rikatekê duduyan nîmêj bike, ibadet heye ji
bo Xudê ye.

MEM

Bekir, gava yeki nexweş qenc bîbe, wê rabe
nîmêj bike. Hemîn ibadet ji bo Xudê ye.

BEKIR

Memê tu dini. Hışê xwe bine serê xwe. Ew çi
ye te kiriye bin qapûtê xwe û vedîşeri?

QERETAJDÎN

Mirê min, Bekir meriveki sextekar û derewkar
e, ew rext û ruştmê zêrin nin ku Memê xe-
mîn xwe pê direvine. Lê wi ji şerma Mir
qapût avêtiye ser da ku nebe bêrûmeti.

BEKIR

Memê querwaşa hezkiriya xwe di binê qapût da
veşartiye. Ew erebeke reş a lêvdeqin e. Eger ez,
pîzmamê te Bekir derewan dikim, wisan e bila
Memê rabe û rastiyê nişani me bîde. Ev keçika
ereb e, ya ku her roj dizika mast li nav Cizirê
digerine û difroşe.

QERETAJDÎN

(Dî ber xwe da difikire.) Beko dîkeve rikê
Memê, lê heqaretê dîke da ku Memê ji ciyê
xwe rabe. Gelo dî binê qapût da çi veşartiye?
Çi dibe bila bîbe, dîvê ez ali wi bikim û ji vê
tengasiyê xelas bikim. Çimki ew birayê min ê
mezin e.

QM

Jî ber ku Memê xwe lî nexwesiyyê avêtibû û nedixwast rabe ser xwe, Qeretajdin rabû dî şûna wi da fincanên qahwê lî cîvatê belav kir û yek ji da Memê.

QERETAJDIN

(Xwe ji xwe ra.) Ev ne rext û ruştmê hespê wi ne. Gulyek por ji binê qapût va xuya dîke. Ev hebe tunebe gulyen Zinê ne. Gulyen weha dî dînyayê da, bili Zinê lî serê tu jinê tunene. Ge-reke ez alikariya Memê bikim. (Bî deng.) Er-fan, Çekan! Werin qahwê belav kîn. Ez ê herim agir berdime mala xwe, bila koşka mîn a mezîn û zarokên mîn ên zêrin bîşewitîn, dîbe ku hîngê birayê mîn ji vê tengasiyê xîlas bibe.

QM

Qeretajdin hate mala xwe û bî dileki xemgin niyeta dîlê xwe ji jina xwe Periyê ra got.

QERETAJDIN

Derxine derva herçar zarokên me yên zêrin. Ez ê agir berdime xani, belki Memê bikaribe wîsa xwe xîlas bike. Rengeki tari, erebeke reş, Xwedê bîlayekê bide te Beko! Na bisekinin, bihêlin bila zarok lî cihê xwe bîminin, wan dernexinin da ku herçi heye ez súcdar û gunekar bîm. Nuha ez agir berdîdime xaniyê xwe. Lawkê xulam! Here xeberê bide Mir, lî nav baxçe rûniştiye, jêra bîbêje: Xaniyê mezîn, agir pêketiye dişewite! Herçar zarok ji dî nav da şewitîn! Sîbê van çaxan Qeretajdin yek ke-seki ji mir û began sax nahêle. Û jêra bêje Mir, tu Qeretajdin nas dîki -ew meriveki din û dilêr e. Koşka wi ya mezîn dî nav agir û alavê da ye, dişewite- sîbê ew ê agir berde mala te û yên din ji. Bêje zû rabîn hina ne dereng e!

QM

Ü lawkê xulam bî lez û bez ajote nav baxçeyê nependi û xebera Qeretajdin gihande Mir û cîvatê.

SEYDÎN

Weeh! Belayek e hate serê me! Zû bikin, em

bî lez xwe bigîhinin nava Cizirê, Qeretajdinê din wê mala me teva bîşewitîne. Zû bîlezinin! Zû!

MEM

Zinê, delala min. Qeretajdin bî şewitandîna mala xwe, bela wan ji me vekir, berê wan da nav bajêr. Em xîlas bûn.

ZIN

Dîvê ez ji bî lez xwe bigîhînime malê.

MEM

Wê çaxê serê xwe, rûyê xwe bî desmalekê bîpêce û bî lez xwe bigîhîne mala xwe.

QJ

Zinê zûkava ji nav baxçeyê nependi derket û çû. Lî Beko xwe dî pişt dergehê baxçe da veşartibû. Dema Zinê derket li wêderê Beko dit.

ZIN

Herê Bekoyê fesad, roviyê fenbaz. Tu çîma bî bext û qedera me dileyizi?

BEKIR

Ez dixwazîm şeref û namûsa bajarê me biparêzîm. Memê miroveki xerib e, ew lî gor erf adetê me naçe.

QM

Memê ji rabû berê xwe da Cizirê çû ber xaniyê Qeretajdin sekini û lê mêzekir. Xani dî nav agir û alavê da bû.

MEM

Bî xwedê ez ê niha çend gotinan ji agir ra bibêjim. Eger ez evindareki ji dil û rast bîm, agir wê vemire, na ager venemire hîngê evina mîn û Zinê ji derew e.

QM

Memê desmala xwe ya neqîşandi derxist avête nav agir.

MEM

Hey agiro!

Bila Xwedê şahidê rastiyê be dî navbera min û te da.

Te ji mala birayê min çi dîvê,
Erê malxirabo! agiro, te agûrê bê nav û bê ruh
Bese, vekişê ji xaniyê me,
Tu çawa gurr bûyi, nefesê digre ji pêt û alavê xwe

Ez ji dikarim wek.

Herê agûrê nepêbawer! Bes e, bes!
Te ne male ne ji hale,
Malxirabo mêzeke!

Ez desmala birayên xwe davêjime nav alavê bi reqs

Heke ez dildareki rast bim, ji dil
Dîvê tu bitemiri bî alav û hilma xwe.
(Effekt- agir vedimire)

BEKIR

Mirê min. Memê wa li wêderê sekiniye û heta lehzek berê ji nexweş bû nikaribû rabe ser xwe. Wi ji te û navê te ra, bêhurmeti kîr. Heqê wi bêşerefi derhal kuştin e!

SEYDÎN

Memê li baxçeyê nependi gotübû ez nexwes im. Nuha ji rabû ser xwe sîp û saxlem digere. Wi leke ani ser şerefa min! Wi derhal bûkujin!

QERETAJDÎN
Erfan, Çekan, birayên min ên egit! Hay jê hebin, Memê dî xeterê da ye.

ERFAN + ÇEKAN
Şûrê me wê ji bo xatirê Memê bîlîve.

QERETAJDÎN
Mir! Tu hazır be ji bo şereki mezîn di navbera me çar bîran û begêne te da.

MEM

Beri tu min bîrindar biki, ez ê sêsed kesen te bêeman kîm, çarsed kesi ji hev belav kîm. Lî beri vê ez ê te ji holê rakım.

QM

Mir û begêne Cizirê herçar bira li wir hiştun û çûn. Bêî ku dilopek xwin bête rêtin. Lî êdi dostaniya navbera Qeretajdin û began nemabû

ZİNA REMILDAR

(Bî qûmê fal vedike) Ka ji min ra bîbêje ey qûma ebedi, veqetine Memê ji wan hersê biran, dûr bixe Memê ji birayên wi...

BEKIR

Dîvê Memê ji birayên xwe bête cudakîrin. Ew geleki jir û mîrxas in, dema ew pêra bin, girtin û zindani kîrina Memê ne hêsa ye. Ew pir jir û mîr in, hersê ji mina şêr in.

ZİNA REMILDAR

Memê wê bî serê xwe tik û tenê bîmine. Hersê bîra rî nişanî du siwarênen xerib dîdin. Ew siwar ji aliyê mirê Belg-Muxrê hatîne şandîn. Du siwar...

QJ

Du siwar bî çargavi dajon û tê. Hespêñ wan bî rengê xwe va şinboz in, lê dî xwêdanê da reş bûne.

QM

Mir Seydin, desthilatê Cizira Botan. Me ji mirê te yê mezîn emîrnameyek ani. Dîvê tu derhal mora wê veki û gotinêni wi bixwini.

SEYDÎN

Ez li te emîr dîkim ku tu dî nav bist û çar saetan da deh hezar leşker hazır biki û Qeretajdin û dî birayên wi biki serleşker. Eger tu van gotinêni min neyni ci, ez ê serê te ji gewdê te bîkim. Mirê Belg-Muxrê . Mirê miran, yê hemû dînyayê.

QM

Dema mir ev gotin xwendîn, çokêni wi sist bûn. Vegeriya ser Beko û jêra got.

SEYDÎN

Xwedê bîlayê bîde te! Te fesadi kîr, te bî derewênen xwe em û ew li hev kîrin dijmin!

BEKIR

Mirê min, min xwast şerefa te û bajarê te biparêzim.

(Berdewam dike.)

Strana

Folklori

Em lı ser sistemê çı dizanın

Ahmed Muhammed Ali

Pêşgotun

Dı pirtûka "Strana Folklori" di beşa sisîyan da Dr. A.M. Ali, lı ser pêwistiya peydakırına sistemek ditinên xwe pêşkêş dike. Sistemek ji bo ferhengkirin (tasnifkirin) û ji hev cudakırına stranên folklori. Lı gor bingeha avabûna wan a muziki, ango lı gor: A- Ritm. B- Parçen awazê. C- Hereketa awazê, ku her beşek ji wan dibe sitûnek ji bo avakırına sistemek ferhengi yan ji tasnifkirinê.

EM LI SER SİSTEMÊ ÇI DIZANIN

Bartok, ji bo tasnifkirina stranên folklori lı gor ritmên wan sistemek pêk ani.

Koday, ji bo sistema xwe perçen awazê kiriye bingeh.

Yardani, hereketa awazê dike bingeh.

Hersê muzikvanêñ jorin Macari ne û demeke dirêj di warê lêkolinêñ muziki da xebîtine. Wek ku em dibinîn, ji bo tasnifkirina perçen awazê û stranên folklori yên Macaristanê her yek ji wan xwedi sistemek taybeti bû. Jı ali akademi-

ki da ferqiyeck dı ditinên wan da hebû û afirandîna van sistemek ji bo gîhiştuna hemû qonaxêñ muzika folklori pêwist bû.

Sistem, bı gotuneki din metodêñ ferhengkirin û tasnifkirina awazan bı rengeki kêrhati û lı gor xusûsiyeten wan e. Ev awaz (3) û perçen strani (4) tên civandin û ferhengkirin. Bı rengeki ku dı çaxê pêwistiyê da meriv bikaribe bı hêsanî dest bavêje wan da karibe bı hêsanî analiz û danberhevê bı parçeyen din ra bike. Yan ji ew awaz û parçeyen muziki bîbin materyal ji bo kompozitoran da ku karibin ji wan kelk bigrin.

Bı rengeki giştî, em karin ew sistemêñ lêkolînê yên lı cihanê naskiri, çı Macari, çı Finlandi, çı Yugoslavi, bixebeitinîn. Lê, her muzikek karaterek xwe yê taybeti heye û ew karakter pêwistiya sistemek bı serê xwe tine meydanê. Wek ku KODAY dîbêje: " Em nikarin sistemek bı tenê û bı rengek mekaniki û hazır bixebeitinîn. Jı ber ku sistema heri baş ew ku bikaribe xusûsiyeten hemû awazên folklori yên cihê bide xuyakirin."

Jı bo afirandına sistemeki taybeti, bı taybeti jı bo muzika me, imkan pêwist in û ev mijar du şert tine pêşberi me. 1- Mirovên pîspor ên muzika folklori. 2- Hejmareki pîr mezin stranê folklori bêne Cîvandin, qeydkırın û analizkırın.

Karên weha demeki dirêj dikşine ta ku em bigihijin hemû qonaxêñ teorik û praktik ên mebesta me.

Bı rengeki giştı em dîkarin bêjin ku, jı bo serketün û encamek rast dîvê di dema cîvandin, qeydkırın û analizkîrinê da dî navbera kesen pîspor da hevkariyek peyda bibe. Encamêñ vê xebata han dibin yek jı şertên pêşketin û şiyariya tevgera muziki ya mîletek. Jı ber ku têkiliyêñ xurt û elementer ên vi xebati, ligel beşen din ên çalakiyêñ muziki wek, pêşkêşkîrin, xwendin, belavkîrin û afirandına muziki hene. Jı ber vê yekê lezkîrin jı bo afirandına sistemek ferhengi, bı taybeti pêwist e. Anglo şertên lêgerin, qeydkîrin û analizkîrinê bêñ peydakîrin. Afirandına sistemek taybeti nayê wê manê, ku em guh nedin şewe û sistemên lêkolîn ên cihani. Naskırına sistemên cihani lı ba lêkolinger bingeh û ditinêñ giştı yêñ afirandına sistemek taybeti û akademik peyda dike. Lê jı bo afirandına sistemek taybeti, pîrsa heri giring lêger, qeydkîrin û analiza materyalan e. Ev xebata han fîrsend dîde ku lêkolînvan karakter û şeweya muzika xwe têbigihije. Eger ev xebata han bı serkeve, ew dem em karin hisê xwe bı tevayı bidin ser afirandına sistemek ku xusûsiyetêñ ew muzika han bide xuyakîrin û karîbe xîzmeta xebata muziki yêñ pêwist bike.

Têbini:

1- Jı ber ku her grûbek stranê folklori hin elementen xwe ên hevpar hene, ku yek jı wan ji ritm e. Em dîbinin ku Bartok, stranê ku xwedi ritmên wekhev bin kîriye dosyayek û li ser dosyayê navê ritm dînivise. Ligel vi dos-

yayê dosyayek din ji çedike da ku gotin û awazêñ stranan têxe navê. Minak:



(Sirovekirina wergervan 1- Mebesta wi ji ritmên wekhev ew e ku, hejmarêñ notayan di yek bari da wek hev be, ne qimeta notayan. Metronomêñ van ritmên han dikare ji hev cuda bin, angò di her bareki ji van hersê baran da qimeta notayan a matematiki ji hev cuda ne lê hejmarêñ wan wek hev in.)

2- Ez bawer im mebesta niviskar ew e ku, li gor rêveçûna awazê stran ji hev bêñ cudakîrin, angò ji notayek bilind (cewab) hêdi hêdi bê ser notayek nizim (qerar). Ew ji şeweya stranêñ pîr kevn in, yan ji ji notayek nivekê dest pê dike û hildikşe jor û pîstre hêdi hêdi tê ser notaya nizim, ku ev ji piri caran şeweya stranêñ nûdem in.)

2- Studia memoriae Belae Bartok, rûp: 12

Werger: Xoşnav û A. Gernas

Serrastkîrinek:

Dî hejmara 37'an da, dî rûpelê berevoka terman da, bı şâşı peyva "garîs" vek navê darekê hatiye diyar kîrin. Em hêvidar in xwendevan vê şâşiyê li me bîborin.
Redaksiyona RN.

Nîvisara jêrin ji pirtûka "Diroka Dînyayê 1" hatiye wergerandin. Pirtûk bî zimanê danimarki hatiye nîvisandîn û navê wê orijinal "Verdens Historien 1" (Diroka Cihanê-1) e. Ew ji ali çend kesan va, bî xebateke kollektiv hatiye amadekirin. Nîviskarên pirtûkê Dr. N. H. Bang, Dr. Fridtjuv Berg, Mudurê Dibistana Gelêri (Folkeskoleinspektör) Ingvor Bondesen û Nordahl Rolfsen in. Pirtûk ji ali "Pirtûkxana Gyldendal", li Danimarkayê hatiye çapkirin. Me dî hejmara çûyi da beşekê wê weşandibû. Dî vê hejmarê da ji em parçeki wê diweşinîn.

BAWEREYA KEVN A PERSAN

2- JİYANA EXLAQI

Wergêr: Y. Çakmak - A. Gernas

Lî gor baweriya AVESTA, serûberiya jiyanê tenê lî dînyaya maddi nine. Riya jiyana ruhi ji heye ku dîvî insan dî wê şopê da bimeşin. Çawa insan nikaribe bê nan û av biji, her wîsa dî demek dûr û dirêj da tu kes nikare bî bêdadi û nebaşî ra ji biji. Jî bo ku jiyan bîbe xwedi maneyek, dîvî vana hebin. Her kesê ku viya têbîgîhije, dadiyê wek qanûna xwe dizane. Lewra li gor AVESTA, insanê bîdad (bî edalet) wê biji. Û Kesên bêdad û bêbawer wê mecbûri bîkevin avzêlê yan ji dî geliyeki da tera bibin. Ev qanûn û sistema siruştê ye û tu kes nikare dervayı vê jiyanê biji.

Mesaja yekem û mezintirin a AVESTA, hezkırına rasti û bawermendi ye û pêra sadıqbûn û li ser sozê xwe sekînîn e.

Herodot ji berê va dizanibû ku evya fam û

firasetê Persiyan e. Persiyan ji 5 sali heta 20 sali zarokên xwe bî van hersê tiştan perwerde dikirin, dîbêje Herodot: Ew (Persi), derewê wek eyb û quşûra heri mezîn dîditin; piştre ji deyndariyê, "lewra kesên deyndar bî taybeti derewan ji dikin."

Em bî her awayi dî AVESTA da rasti vê baweriye tên.

Taybeti Xwedayê Rojê MITHRA, mirê rastiyê ye. Ew çavnêriya bîcihanina her herêkîrin û peymanê dike.

Xwedayê Rojê bî xwe, bî hereket û tewrêxwe yên bî serûber minaka pêbawerbûnê ye û ew ji insanan eyni bawermendi, sadıqbûn, rasti û dirustiyê dixwaze. Jî ber ku hemû lihevhatin an ji peymanê navbera insanan lî ber çavên Mithra pêk tên, ew dîbin baweri û nikarin bêne xırakîrin, zêdetir ji dî derbari pêwendiyêñ



Mithra: Digel Xudayê hiv û royê. Relif ji sedsala 2.

navbera insanan da.

Lı gor giringi û piroziya xwe, peymanê navbera insanê du nav-çeyên cuda piroz e û nayê betalkırın; peymana navbera du insanê eyni hêlê nayê betalkırın û piroztir e; peymana navbera du endamên maleki jî yên dîn ji piroztir e û nayê betalkırın; lê peymana navbera bav û kur a pirozturin e û nayê xirakırın. Şahidiyeke cîwan jî bo exlaqê bîlind ê gelê AVESTA: "Xwedênenasê ku peyman an ji lihevhatineki betal bike, hemû welat dikuje", dibêje MAZDA. Anglo derew û mirin dikevin eyni mîzinê, eyni sewiyê. "Zerdeş, bî ki ra dibe bîla bîbe, dixwazi bîla bî xwedê-nenaseki ra be dixwazi bî insanek dirust ra be, peymana ku te bî cih ani tu car vira nake, peymanek bî ki ra hatibe çêkîrin derbas dîbe, dî cih da ye!..." Jî ber vê yekê xwedayê MITHRA, çi lî dorhêlek teng çi ji fireh, qimetî dîde jiyanek bî hev ra ya insani (humanisti). Jîxwe yekiti û jiyanâ ligel hev bingeha jiyanâ lihevhati ye û nexirabûna peymana navbera insanan e.

Jî bo jindariya jiyanê û domandına wê, baweri û hezkırına rasti tiştên pêwist bûn, mecbûri bûn. Ev, zagonê (yasayê) jiyanê bûn. Xwedayê Rojê lî dû vê zagonê dîce û jî ber vê yekê ji heta û heta (ebedi) diji: Tevgera rojê ya rojane û salane ya pêbawer û sadîq, jiyanâ wê ebedi dîke. Jî bo insanan ji eyni tişt derbas

dîbin: Kesê ku lî gor zagonê qanûneki serûberi dîdin xwe û jî ber vê yekê dîbin insaneki pêbawer, xwedi sıruşta (tabiat) jiyaneki ebedi ye. Lî gor baweriya AVESTA, fêlbazi û derew, ji ehmeqi pêştir tiştek nine, lewra insanê ku jiyanâ xwe lî ser fen û derewan ava kiriye, nikare jî bo demeki dûr û dîrêj serketi bîmine, mehkûmê windabûn û mirinê ye. Dî AVESTA da peyva "DRUJ" tê bî kar anin, ku mana wê "fêlbazi, bî fen û fût, hilebaz" e; ev peyv, dî zimanê Norveçi da, ku jî bo şeytanê mirinê yê avê tê bî kar anin, hevmaneya "Draug" e. Hilebazi, sıruşta mirinê ye, jî ber ku meriv tu car nikare lî ser derewan jiyaneki ebedi ava bike. Zagona jiyanê, bî gotuneki din garantiya riya jiyanâ ruhi, bê qeyd û şert pêbaweri û pêemini ye.

Hîm bedeni û hîm ji ruhi jiyanâ xwe biparêze!, dibêje ev din. Av û darûber, ax û heywan jî bo bicihanina vê fermanê alikariya me dîkin, jî ber vê yekê ew dî xîzmeta Xwedê da ne, piroz û xwedayı ne. Lê dadmendi û paki dî eyni derecê da meriv dîgihîne armancê. Mirên mirinê, ango Şeytan, gava zad (genim, ceh û hwd) dîgihije, av tê peşkilandin, rasti û dadi hukum dîke direvin, lewra dî hemûyan da eyni qeweta jiyanê ya xwedayı bandora xwe nişan dîde. Jî ber vê yekê dî baweriya insanê dirust û bawermend da, ew xwe lî aliyê avan, darûberan û hemû afirandiyê baş dîbinin.

*Ahura Mazda û
Angra Mainyu:
Lewha ji mede-
niyeta kurdên
Zagrosê û ji
sedsala 8. B.Z.
maye.*



Ew him di dînyaya ruhi him ji maddi da, bî Xwedayê Jiyanê bawer dikir. Daxwaziya AHURA MAZDA serketina jiyanê ye û ji Şeytan rizgarbûna dînyayê ye. Lewra Şeytan ji mirinê pêştir tiştek nine lî dînyayê. Ev baweriya Persên kevn, nêrina wan a tarixa dînyayê dikemiline. Ew di viya da mane dibinin.

3- DİROKA DINYAYÊ

Baş û xirab, qewetên xwedayı (ilahi) û Şeytan, ango şerê navbera mirin û jiyanê, şereki bêdawi û bêplan nine. Dema ku Şeytan an ji Ahriman, xusûsiyetên mirinê di hemû mexlûqatên baş gerand, şer dest pê kîr. Mana têkoşinê ji bo serfiraziya jiyanê yan ji ramana amadekirina insan û mexlûqatên dinê ye, ji bo vi şerê dinê yê mezin amadekirin û xurtkîrin e, ku jiyanek nû yê cenneti dest pê dîke. Ew nemiriya ku demeki hatiye windakîrin, wê ji bo herdem û ebedi cardîn paşva bête bîdestxîstîn (qezencikîrin); wê mirin bête mexlûbkîrin û windakîrin; wê hukmê wi yê ser miriyan biqedî, ku miri azad bibin û ji gorêن xwe rabin û di bedenêن xwe yên yên nemir da bixemilinin, jiyanek ebedi bijin.

Wê di dawiyê da tarixa deman (zemanan), ji destpêkê heta dawi, ji sibeha yekem a deman heta sibeha nû, zêdebûna jiyana ebedi bîde yan peyda bîke. Ev raman wek saleke dirêj a dînyayê yan ji rojek dînyayê tê ramandin. Lî gor baweriya Persan, çawa salek wek 12 meh û rojek ji wek 12 cot saet beş dîbe, ev traject-

diya mezin a dinê û tarixa wi ji, 12 hezar sal dom dîke. Çar serdemê mezin heye û her serdemek ji 3 hezar (3000) salan pêk tê û serdemâku em tê da dijin, ê dawi ye û nêzi qedandinê ye. Ji destpêkê va ev herdu ruh, MAZDA û AHRIMAN hebûn. Di 3000 salêن yekem da, ew, raman û ruhê hemû mexlûqan, ango seranseri dînyayê bî şikleke rûhi diafîrinin. Ruhê insanan ji, hemû ruhbarêن dinê ên ku piştre wek fiziki têن dînyayê, wê demê ji ali MAZDA va hate afirandin. Hêj dînya wek fiziki an ji herbîçav nehatibû afirandin. Ruhê xirab AHRIMAN, wek herdem, nezan û bêfam e û heta ku 3000 salêن yekem derbas nebin MAZDA û afirandiyêن wi nikare bibine. Lê edi dereng e, lewra niha ev dînyaya baş ji têkoşinê ra amade ye. Dînyaya maddi ya ku dîbe meydana şerê herdu ruhan, ji ali van herdu ruhan va di serdemâ 3000 salêن duyem da tê afirandin. MAZDA, ruhê insanan serbest berdide, rê dide ku ew bîkevin bedenêن xwe û bî wi (Mazda) ra bî rayêن xwe yên azad cihê xwe di vi şeri da bîgrin. Ew (insan) têkoşinê hildibjêrin, lewra yê heri bî qewet xwe dibinin an ji his dikin; lewra ji mêj va encama bîketina dijmîn û hebûna jiyanek ebedi dibinin. AHRIMAN, hemû tiştêن dinê diafîrine; bî wan (afirandiyêن nebaş), ji bo hemû afirandiyêن MAZDA yên rûyê erdê û ezman felaket û mirin diciine. Heywanêن bî zîrar, mar, dûpişk, kızînde û amfibiyum lî her deri belav dibin, da ku "tu tiştek, tişteki bî qasi şerê derziyê ji ji bela heywanêن bî zîrar nefilitin." Di serdemâ 3000 salêن sisêya da

herdu ali wek hev in (ango rewş û qeweta wan wek hev in); lê ev serdema ku em tê da dijin bi bûyina ZERDEŞT dest pê dîke, şefeqa roja nû davêje û aliyê MAZDA dî têkoşinê da bî ser dîkevin û rêvebiriyyê dîkin destê xwe. Û dî dawiyê da, SAOSYANT ango azadkar, hemû hêzên tari yên rûyê erdê belav dîke, jî bo destpêkirina roja nû û jiyana nû jî rojhîlat radibe.

Lî gor AVESTA derbari dawiya dînyaya kevn û çêbûna dînyaya nû da, ango dema ku serdema nû dest pê bike, wê keçek bakire lî gola rojhîlat xwe bişo; lî wê derê wê keçek bakire bî zarû bimine û azadkareki (SAOSYANT) bine dînê. Ev bûyer dî Avesta da weha tê rawekirin: "Wê azadkar (Saosyant) hemû dînyaya maddi rizgar bike û bixemîline." Lî gor baweriya Persan, ev azadkar, ew kes e ku vedigere dînyayê û serketuna jiyanê temam dîke, ango ZERDEŞT pêxember bî xwe ye. Diya wi, ango bakireya rojhîlat, bî maneya "Serkevtiyyê her tiştî" hatiye bî nav kîrin. Lewra -dibêje AVESTA- "Ew (diya Zerdeş), wê ew kesê ku xîrabiya Şeytan û insanan jî holê rake bine dînyayê." SAOSYANT û hevalên wi, "ku tu car peyveki ixanetê neanîne ser zarêr xwe", diçin şerê mezîn ê dawi. Dî vi şeri da derew û mirin têr mexlûbkirin; "DRÛJ", meleka mirin û ruhê sextekariyê, jî ali çekdarêni jiyanê têr kuştin, û Ahri man ango şeytanê heri mezîn, hemû hukmê xwe wînda dîke û direve. Û niha "SAOSYANT, imkan û mecalâ peydakirina dînyayek nû, -jî pûçbûn û rizandinê dûr- pêşketin û jiyanek ebedi, dînyayek ku xwedi azadiyek kemîlandiye peyda dîke; niha êdi hemû mîri vedijenin û hemû jîndar dîgihîjin nemîriyê."

Dî vê dinê û dî vi gelî da, hewesa jiyan û daxwaza têkoşinê hebû. Wek ku hate rawekirin, bî destpêka şerê dînyayê ra van insanan jî ber xwe va derheqa êş û binketinan da, derheqa encama şer da agahdar in û jî bo kışandina êş û kulan amade ne û herweha bî vi çavi lî jiyanê dînihîrin. Ev didem ji, dide xuyan ku ew ne xelkeke jar an ji zeyif e. Tiştî heri baş ê ku xelkê AVESTA dizanin:

Pêşdebirina jiyana dînyayê û dî şerê dîj mirinê da besdari ye da ku dî dawiyê da bigihijin serketinê û doza Xwedê ya dînyayê xurt bikin. Hemû dindar û insanê baş hevalbend û alikarêni Xwedê yên sıruştî ne; wê herkes jî bo serketuna jiyana ebedi piştgiri yan ji alikariya xwe nişande.

Em bî vê nuqtê dîkarin gelek yasayênen xerib ên Avesta rawe bikin. Kesênu ku lî hember şeref û terbiyê sûc bikin, ya wê lî ser cuhan (kanal) 30 pir ava bikin, ya wê 1000 mar bikujin, ya 1000 amfibyûm (heywanen) ku him lî rûyê erdê him ji dî avê da karin bijin), yan ji "kurmoriyên ku hezar tene zad dizine" bikujin. Jî bo sûcên dîn, lî der zeviyan kolandina cuhêv avê, raykırına navginen kar ji bo cotkarek û disa ji bo cotkar avakırına axurek, keça xwe bi yeki bî şeref ra zewicandin û hwd ceza hebûn. Mana wi ev e: Jî ber sûcên ku hatine kîrin hukmê ruhê xîrab, ango ruhê mirinê, lî dînyayê zêde dîbe jî ber vê yekê dîvê ew (kesen bî sûc) ji bo xurtkirina pêşketin û jiyanê cezayê xwe bîkşine. Gelek jî van "cezayan" tenê lî ser kaxîz hebûn; dî rastiyê da tu kes nîkaribû 1000 yan jî bo hîn sûcên dîn 10.000 mar bikuşa û bî vi awayi bîhatâ cezakirin. Lî tevi vê rewşê ji, ev baweri di AVESTA da cihê xwe dîgre û bêşik cezayêne weha pir caran hatine bî kar anin.

Yewnani dibêjin ku, keşeyen persan an ji emsalen keşeyan kuştina maran û amfibyûman, ku xîrabi jî wan çedîbin, wek lêborina sûc û xîzmetek dîni dipejirin. Her kîmani û afirandiyek xîrab, qeweta xîrabiye qels dîke; û zêdeyiya her afirandiyek û her kareki baş, hukmê Xwedê zêtur û firehtür dîke. Dîvê lî vê derê herkes wezife û alikariya ku dîkeve ser milê wi bî cih bine. İnsanê baş, wek MAZDA bî xwe, "başkarê dînyayê", yên bêxwedê ji wek "kujdar an ji mîdarê dînyayê" têr bî nav kîrin. Her karek baş an xîrab, maneki xwe yê diroki heye. Her insan ya hevalbendê Xwedê ye yan jî yê Şeytan e.

(Dumahik heye)

CİGERXWİN


KİME EZ

Diwana SISÊYAN

RONAK

Diwana ÇARAN

WEŞANÊN DENG



Bîha: 15 Skr.